Lêkolîn

# Binpêkirinên rêxistina DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê

## Danasîna qanûnî û dadgehên tayebet (Beşa Yekem)[1]




**Navenda Firatê ya Lêkolînan**

Bi erebî peyda ye

Bi Îngilîzî peyda ye

## Puxte

**Jinavbirina DAIŞ`a terorsît di çarçoveya têkbirina leşkerî de têrê nake, çimkî gerek e çareyek ji paşmahîyên wê, ji jin, zarok, şaneyên veşartî û endamên wê yên li girtîgehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re jî bê dîtin.**

**Çekdarên DAIŞ`ê, di dema serdestîya xwe ya li hin herêmên Sûrîyayê de, sûcên herî tund der heqê gelên herêmê de pêk anîn.**

[1] Ji ber dirêjahîya lêkolînê di biwarê hejmara rûpelan de û dubendîbûna wê di navbera alîyên teorîk û pratîkî de, me ew kir du beş; beşa yekem ji alîyê qanûnî yê teorîk ve hatîye veqetandin, ku em tê de şiroveya qanûnî ya binpêkirinên çekdarên DAIŞ'ê yên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê dinirxînin.. Beşa duyemîn dê ji alîyê pratîkî yê dadwerî ve were veqetandin, em ê tê de li ser mekanîzmayên dadwerî yên gengaz ên darizandina endamên DAIŞ'ê yên li girtîgehan lêkolîn bikin.

**Lewra, pêwîst bû destpêkê danasîna qanûnî ya wan sûcan bê lêkolînkirin. Paşê jî, mekanîzmeyên dadwerî yên pêkan ji bo dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê bên vekolînkirin, û her wiha em balê bikişînin ser astengîyên li pêşîya bicihanîna dadmendîya tawanan ji qurbanîyên vê rêxsitina terorîst re.**

## Pêşgotin

Pêwîst e di qonaxa piştî têkbirina rêxistina DAIŞ`ê ya leşkerî de, çawanîya danûstandina bi paşmahîyên wê yên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re were vekolînkirin, ev paşmahîya ku ji şaneyên wê yên veşartî, jin, zarokên li kamp û navendên bicihmayînê[2], û endamên wê yên berê li girtîgehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi taybet, pêk tê. Ewan çekdarên ku hejmara wan bi hezaran e, sûcên herî tundrew û hovane der heqê gelê sûrî de pêk anîn, nemaze der heqê kêmarên etnîkî, olî, û nijadî li herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.

Vekolînkirina danasîna qanûnî ya van tawan û mekanîzmeya dadwerî ya pêkan ji bo dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê, girîngîya xwe ji wê yekê tê ku di demekê de civaka navdewletî, bi serkêşîya Encûmena Ewlekarîya Navdewletî, bi berpirsyartîya xwe ya di ber parastina aramî û ewlehîya navdewletî de ranabe, ango bi awayekî cidî ti çareserîyan ji paşmahîyên DAIŞ`ê re nabîne, ev yeka han hişt ku Rêvberîya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê biryara dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê li gorî qanûnên xwe li pêşîya dadgehên xwe bide, ev gava han jî weke berpirsyatîyeke ku Rêveberîya Xweser daye ser milê xwe tê dîtin.

Dewleta Îslamî li Îraq û Şamê, anku bi kurtenavê xwe yê "DAIŞ ISIS" tê nasîn: girûpeke cîhadîst a tundrew e, ew bi eslê xwe ji rêxistina EL-Qaîdayê ya terorsît veqetîyaye[3], û paşê çalakîyên xwe ber bi Sûrîyayê ve berfireh kirine, ew jî piştî ku sala 2011`an li wê derê xwepêşandanên gelêrî encam dan. Bi derketina şerê Sûrîyayê re, rêxistina DAIŞ`ê bi serkêşîya "Ebû Bekir El-Bexdadî" derket, ew jî piştî tevlî "Cebeht

[2] مركز الفرات للدراسات "أطفال داعش في المخيمات ومراكز الايواء: المخاطر والإشكاليات وسبل الاحتواء"، متوفر على العنوان التالي: https://firatn.com/?p=3913

[3] Di sala 2003`an de, terorsît Ebû Mis`eb El-Zerqawî komika bi navê "El-Tewhîd welCîhad" li Iraqê damezirand, ku vê dawîyê piştî ku tevlî Rêxistina Qaîdayê bû di 2004`an de, navê wê bû "El Qa`îda fî Bîlad El-Rafîdên", piştre jî li Iraqê veguherî "Dewleta Îsalmî li Iraqê". Lêveger:
"فيما يخص الجذور التاريخية لنشأة تنظيم داعش وتطوره"، آلاء ناصر حسين، نبراس ابراهيم مسلم،" المسؤولية الجنائية الدولية عن جرائم عصابات داعش الإرهابية"، مجلة العلوم القانونية، جامعة بغداد، 2017، متوفر على العنوان التالي: https://jols.uobaghdad.edu.iq/index.php/jols/article/view/75/52

Nûsra"yê bû, baskê El-Qaîdayê li Sûrîyayê, ku "Ebû Mihemed El-Colanî"[4] serkirdeyê wê ye.

Şerê li Sûrîyayê ji bo rêxistina DAIŞ`ê derfeteke zêrîn bû, ku bi rêya wî şerî dikarî herêmên berfireh kontrol bike[5]. Her wiha vê rêxisitinê gelek kesên bi îdyoljîya wê bibawer, ji derveyî Sûrîyayê û ji neteweyên cihêreng ber bi xwe ve anîn. Hejmara endamên wê gihîşte derdora 30 hezarî, û ji gelek neteweyên cihêreng bûn: Ji welatên ereb, Ewropaya rojavayî û rojhilatî, û welatên asyayî[6] bûn. Piranîya endamên DAIŞ`ê bi rêya balafirgehên dewleta Tirk û sînorên wê yên hevbeş bi Sûrîyayê re derbasî xaka sûrî bûn, evê yekê hişt ku rêxistina DAIŞ`ê ji hêla leşkerî ve bide pêşîya girûpên din ên çekdar ên li nav şerê Sûrîyayê, her wiha hişt ku bibe hêzeke leşkerî ya birêxistinkirî û rûberên berfireh ji Îraqê heta Sûrîyayê kontrol bike.

Di sala 2013`an de, serkirdeyê rêxistinê Ebû Bekir El-Bexdadî – piştî ku hevalbendîya wî ya bi "Cebhet El-Nusra"yê re têk çû- rêxistina bi navê "Dewleta Îslamî li Îraq û Şamê" ragihand. Her di hezîrana 2014`an de, wê rêxistinê xwe weke "Xîlafetê" ragihand, û El-Bexdadî xwe weke "Xelîfeyê cîhana îslamî" destnîşan kir, paşê ji misilmanan xwest ku bibin alîgirên wî, û bajarê Reqayê yê sûrî weke paytexta qaşo "xîlafet"a xwe ragihand[7].

Armanca DAIŞ`ê her avakirina dewleteke Teokratîk a li gorî şîroveya wê ya taybet bi şerî`eya îslamîk bû, bi taybet vegerandina xîlafeta îslamî ya ku bi têkçûna Dewleta Osmanî re[8], bi dawî bû. Ji bo vê yekê, DAIŞ`ê binesazîyeke taybet bi xwe da avakirin, da ku desthilatdarîya xwe li deverên li jêr kontrola xwe bisepîne. Ev binesazî jî ji van alîyan pêk dihat: El-Husba (polîsa sivîl), dezgehên ewlekarîyê (hêzên îstîxbaratî), dadgeh, û hin sazîyên ku bi tecnîdkirin û leşkerkirinê radibûn. Her wiha "El-Husba"yê, ku tîmeke jinan a taybet e (Lîwa El-Xensa) ji bo sepandina

[4] Li gorî biryara Encûmena Ewlekarîya Navdewletî ya ku di rûniştina xwe ya jimar 7242, di 15`ê tebaxa 2014`an de hat standin, ew weke rêxistineke terorîst hat destnîşankirin, belgeya wê jî ev e: https://2u.pw/gx5y2A6

[5] Lêveger: "ما بعد دولة الخلافة: الأيديولوجيا، الدعاية، التنظيم والجهاد العالمي"، مجموعة باحثين، مؤسسة فريدريش ايبرت، مكتب الأردن والعراق، 2021.

[6] Heman çavkanî.

[7] Encûmena Mafên Mirov 69/28/hrc/a sibata 2015`an.

[8] "ما بعد دولة الخلافة: الأيديولوجيا، الدعاية، التنظيم والجهاد العالمي".

merc, siza û cezayan li ser jin û keçan li tevaya deverên jêr kontrola rêxistinê, hat avakirin[9].

DAIŞ`ê gelek kiryarên hovane, û tirs û tundûtûjî kire dilê civakên xwecih de, îcarê pê re, têgiha "DAIŞ" bû hevwateya tûndîya zêde ya li dijî sivîl, şervanê dîl li cem wê,[10] û li gorî gelek raportên navdewletî, evê rêxistinê gelek sûcên der-mirovî û der-qanûnî, ku qanûna navdewletî ya mirovî û qanûna navdewletî ya mafê mirov binpê kirin pêk anîn. Li gorî wê, êdî DAIŞ bû rêxsitineke terorîst, û navê wê xistin lîsteya terorê ya Neteweyên Yekbûyî û Yekîtîya Ewropayê. Encûmena Ewlekarîya Navdewletî, di biryara xwe ya jimar (2379) de, di 21`ê Îlona 2017`an de, tekez kir ku ev rêxistina han; ji ber sûcên ku dike, rêxistineke terorîst e, û li dijî cîhanê û aştî û ewlekarîya navdewletî gefek e.

Piştî rizgarkirina bajarê Kobanîyê û jinavbirina DAIŞ`ê li wir, di sala 2015`an de, bi berxwedaneke xweser û xwecih, bi destê Yekîneyên Parastina Gel û Yekîneyên Parastina Jinê (YPG û YPJ), êdî ew bûyer bû destpêka bidawîanîna "Dewleta Îslamîk li Îraq û Şamê", û paşê Hêzên Sûrîyaya Demokratîk QSD, bi taybet di sala 2017`an de, bi piştgirîya Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ`ê, bajarê Reqayê yê sûrî, "paytxeta Rêxistina Dewleta Îslamî", dorpêç kir û piştre ew ji terora DAIŞ`ê paqij kir. Evê yekê hiştî ku bi awayekî bilez herêm li dûv herêmê ji destê DAIŞ`ê derkevin, heta ku di adara 20219`an de, li asêgeha wê ya dawîn, li Baxozê DAIŞ bibin ket û hat jinavbirin.

Lê tevî jinavbirina DAIŞ`ê û "xîlafet"a wê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, evê rêxistina terorîst gelek dosyayên bigirêk û nakok li pey xwe hiştin, çi jin û zarokên wê li kamp û navendên rehabîlîtasyonê, û çi jî çekdarên wê yên berê ku niha li girtîgehan in. Bê guman vê yeka han gelek pirsgirêkên qanûnî bi xwe re anîne, ev ji bilî metirsî û xeterîya şaneyên wê yên veşartî, ku heta niha jî ji ewlekarîya niştecihên bakur û rojhilatê Sûrîyayê re gef in.[11]

[9] Neteweyên yekbûyî, Komeleya Giştî, Encûmena Mafên Mirov- Komîteya Lêpirsîna Navdewletî ya serbixwe ya girêdayî Sûrîyayê, 55/46/HRC/ A 11 Adara 2021.
[10] Encûmena Mafên Mirov 69/28/ hrc/a sibata 2015.
[11] Raporta Komîteya Navdewletî ya taybet bi Sûrîyayê 54/46/HRC/A 21`ê çileyê 2021.

## Pirsgirêka Lêkolînê

Li gorî rêzikên qanûna navdewletî ya mirovî, [12] her şerekî çekdarî yan pevçûnek dabeşî du beşan dibe: **Yek- Şerê çekdarî yê navdewletî**. **Du- Şerê çekdarî yê nenavdewletî**.

Helbet destnîşankirina awayê şer (çekdarî yan neçekdarî), û dabeşkirina wî di navbera navdewletî û nenavdewletî de xwedî girîngîyeke mezin e, çimkî li gorî wê, em dikarin bibêjin ka heta çiqasî qanûna navdewletî ya mirovî li serê tê cîbicîkirin, ew jî bi rêya her çar rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an û her du protokolên zêdek ên sala 1977`an, ji ber ku her rewşeke neyê pênasekirin weke şerekî çekdarî, dê li alîyê dadwerî û qanûna niştîmanî bimîne.

Ji bo awayê şerê sûrî, piranîya raportên navdewletî yên girêdayî rewşa sûrî dibêjin ku "ev şer, şerekî çekdarî yê xwedî taybetmendîyeke navdewletî ye", [13] çimkî Komîteya Navdewletî ya Serbixwe û taybet bi Sûrîyayê da xuyakirin ku şerê sûrî, ji sibata 2012`an[14] ve, gihîştîye kevîya qanûnî ya şerê çekdarî û ne-navdewletî, ji ber dijwarî û dirêjahîya vî şerî han. Her wiha Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor jî, di 16`ê tîrmeha 2012`an[15] ve, ragihand ku şerê sûrî êdî şerekî çekdarî, ne-navdewletî, lê navxwe ye.

Di derbarê awayê şerê li dijî DAIŞ`ê û xwezaya wî de, û gelo DAIŞ weke alîyekî şer tê dîtin? Bê guman, û berî her tiştî em nikarin bêjin ku şerê li dijî DAIŞ`ê şerekî navdewletî ye, çimkî ev rêxistina terorsît di wateya

---

[12] Qanûna Mirovî ya Navdewletî wiha tê pênasekirin: "Komek ji rêgez û prensîbên ku ji hêla navdewletî ve li ser wan lihevkirî ye, armanca wan sînordarkirina bikaranîna tundîyê di dema pevçûnên çekdarî de, ew jî bi rêya parastina kesên beşdarî operasyonên şerî yan jî yên ku nema beşdar bûn, û kesên birîndar, dîlgirtî, û kelûpelên sivîlan, her wiha bi rêya sîordarkirina tundîyê li cengên leşkerî de di çarçoveya xebatên girîng de, ew jî da ku armanca leşkerî bi cih were. Lêveger:
محمد نور فرحات، "تاريخ القانون الدولي الإنساني"، دار المستقبل العربي، ط1، القاهرة، 2000، ص84

[13] Neteweyên Yekbûyî (HRC/CRP/ISIS), raport:
"تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية " حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، 2014/11/14.متوفر على العنوان التالي:
https://www.ohchr.org/sites/default/files/Documents/HRBodies/HRCouncil/CoISyria/HRC_CRP_ISIS_14Nov2014_AR.pdf ، وتقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، A/HRC/31/68، 11 شباط 2016، وتقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، الأمم المتحدة، الجمعية العامة، مجلس حقوق الإنسان A/HRC/46/54 21 كانون الثاني 2021، ومجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ، وتقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، (A/HRC/46/55)، 11 اذار 2021.

Hin raportên din jî hebûn ku me xwe siparte wan.

[14] Komeleya Giştî, Encûmena Mafên Mirov, raporta Komîteya Navdewletî ya serbixwe û girêdayî Sûrîyayê, A/HRC/21/50, 16`ê tebaxa 2012.

[15] https://www.icrc.org/eng/resources/documents/update/2012/syria-update-2012-07-17.htm

qanûnî de, weke dewletekê nayê hesibandin, û di rewşa wê ya heyî de ti sektorên dewletbûnê li cemê peyda nabin, tevî ku navê xwe kirîye "Dewleta Îslamî li Îraq û Şamê". Lê em dikarin wê weke alîyekî şerê çekdar lê ne navdewletî bihesibînin, ji ber ku li cem DAIŞ`ê pîvanên fermandarî, statu, û pêkanîna operasyonên leşkerî yên birêkûpêk û berdewam li dijî dijminê wê, hene, ev ji alîyekî ve. Lê ji alîyekî din ve jî dikarîbû rûberên berfireh ji Îraqê heta Sûrîyayê kontrol bike. Li alîyekî dîtir jî, asta rûbirûbûna leşkerî di navbera wê û hêzên dijî wê de, nîşaneya wê yekê ye ku ev şerê çekdarî yê li dijî DAIŞ`ê xwedî pîvanên şerê çekdarî yê ne-navdewletî ye, çimkî di vî şerî de çekên giran, asmanî û mûşekên rênîşander hatin bikaranîn.

Di encamê de, hemû alîyên şerê Sûrîyayê, di nav de DAIŞ, neçar in ku rêzê ji rêgezên yasaya mirovî ya navdewletî re bigirin, nemaze xala 3`an a hevbeş[16] ji her çar rêkeftinên Cinêvê re, yên di 12ê Tebaxa 1949an[17] de, Protokola Duyem a Zêdekirî ya 1977an[18], û qanûna mafên mirov a navdewletî[19]. Wek mînak, Encûmena Ewlekarîya Netewên Yekbûyî komek biryar li gor beşa şeşan a peymana neteweyên yekbûyî standîye, wek biryara di 14/4/2014 de[20], ku tê de daxwaz ji alîyên şer li Sûrîyayê dike ku rêzê ji mafên mirov re bigirin, dev ji bikaranîna çekên giran berdin û bang li hemû alîyan dike ku dest ji tundîyê berdin.

Tevî vê yekê jî, DAIŞê gelek tawan li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê pêk anîn, di nav de kuştin, îşkencekirin, bombebarankirina bêserûber li ser deverên ku sivîl lê dijîn, tawanên hovane li dijî jin û

[16] Madeya 3`an a di navbera her çar rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an de hevbeş e, pevçûnên çekdarî yên ne-navdewletî di nava xwe de dihewîne, û di sernavên xwe yên mayî de pevçûnên çekdarî yên navdewletî hiştî. Ev dabeşîya dualî di sernavên herdu protokolên zêde yên her çar rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an de belî bû, çimkî protokolê zêde yê sala 1977`an ji bo parastina qurbanîyn pevçûnên çekdarî yên navdewletî hat veqetandin, û protokolê zêde yê dîtir yê sala 1977`an ji bo parastina qurbanîyên pevçûnên çekdarî yên nenavdewletî hat destnîşankirin. Lêveger:
-نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، دار رسلان، دمشق، 2015.

[17] Her çar rêkeftinên Cinêvê yên di 12/8/1949 hatin pesendkirin, û rastî îmzekirin û tevlîbûnê ji hêla Kongreya Dîplomatîk ve hat da ku rêkeftin ji qurbanîyên şerê re bên danîn, ew kongreyê ku ji 21/4 heta 12/8/1949 li Cinêvê hat lidarxistin û di 12/8/1949`an de ket biwarê cîbicîkirinê de.

[18] Protokolê zêde yê duyem ji her çar rêkeftinên Cinêvê re, dîrok 12`ê tebaxa 1949`an, yê girêdayî parastina qurbanîyên pevçûnên çekdarî yên ne-navdewletî, dîroka 10`ê hezîrana 1977`an.

[19] بلواس مريم، "النزاع السوري واختصاص المحكمة الجنائية الدولية بمتابعة مرتكبي جرائم الحرب"، المجلة الاكاديمية للبحث القانوني، العدد 2- 2018، ص 241

[20] Biryara Encûmena Ewlekarîya Navdewletî 2042, dîroka 14/4/2012, li ser vê lînkê: www.un.org/ar/documents/resolutions/2012.shtm1/documents/HRBodies/HRCouncil/COIsyria

zarokan, û binpêkirinên din ên qanûna mirovî ya navdewletî û qanûnên navdewletî yên mafên mirovan. Li gorî vê yekê, pirsgirêka lêkolînê bi pirsa sereke ya jêrîn dikare were kurtkirin: **Pênaseya qanûnî ji girîngtirîn tawanên DAIŞ`ê yên li dijî gelên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê çi ne? Gelo dadgehên taybet bi dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê yên ku li girtîgehên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê dimînin çi ne?** li rex wê yekê, pirsgirêka lêkolînê bi van pirsên han re jî têkildar e:

- Gelo sûcên ku DAIŞ`ê kirine dikevin bin navê "sûcên navdewletî", çi sûcên der-mirovî bin, an sûcên şer, an jî sûcên jenosîda komî bin?
- Gelo pêkan e sûcdarên DAIŞ`ê li pêşberî Dadgeha Tawanên Navdewletî bên darizandin? Her wiha astengîyên li pêşîya vekirina dozeke perpirsyartîya beşî li dijî sûcdarên DAIŞ`ê çi ne?
- Pêkan e sûdarên DAIŞ`ê li pêşberî dadgeheke navdewletî ya taybet bên darizandin, ku ji hêla Encûmena Ewlekarîya Navdewletî ve bê sazkirin, her wekî dadgeha taybet bi Yûgoslavyaya berê yan jî dadgeha taybet bi Ruandayê?
- Gelo mumkin e endamên DAIŞ`ê li pêşberî dadgeheke navdewletî, mîna dadgehên Nurnburg an jî Tokyoyê, bên dadgehkirin, ku ev dadgeha mijara gotinê ji alîyê Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ`ê ve bê damezirandin, yan jî dadgeheke tevlîhev bi hevkarîya Rêveberîya Xweser a herêma Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, ku ev yek jî di çaroveya berpirsyartîya Koalîsyonê li hemberî paşmahîyên DAIŞ`ê be?
- Dawî, gelo mumkin e çekdarên DAIŞ`ê li pêşberî dadgeheke navxwe ya xwecih li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bên dadgehkirin, ew jî li gorî qanûnên Rêveberîya Xweser? Û gelo astengîyên li pêşîya avakirina dadgeheke bi vî rengî çi ne?

**Armancên Lêkolînê:**

- Balkişandina li ser dosyayeke binakok û girêk ji dosyayên ku DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê li pey xwe hişt, ew jî dosyaya girtîyên DAIŞ`ê li girtîgehên herêmê, her wiha xwestina ji civaka navdewletî ku di ber çareserkirina paşmahîyên DAIŞ`ê de bi erka xwe rabe û xebatên berbiçav bimeşîne.

- Heta ku dosyayek ji dosyayên paşmahîyên DAIŞ`ê bêçareserî bimîne, û di demeke ku civaka navdewletî li ser ti çareserîyên domdar naxebite û guh nade mijarê, gerek e Koalîsyona Navdewletî ya li dijî DAIŞ`ê berdewam be, û li herêmê bimîne.

**Girîngîya Lêkolînê:**

- Dabeşandin û bibelgekirina sûcên herî girîng ên DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.
- Danasînkirina qanûnî ji binpêkirinên DAIŞê re, û tevlîkirina wan di nav cureyên tawanên navdewletî de, çi tawanên der-mirovî, çi tawanên cengê,û  çi jî tawanên jenosîdê.
- • Ravekirina mekanîzmayên dadwerî yên muhtemel ji bo dadgehkirina tawankarên DAIŞê, û ronîkirina astengîyên li pêşîya dadgehên navdewletî di mijara dadgehkirina sûcdarên DAIŞ`ê de.
- • Destnîşankirina zehmetîyên li pêşîya prosesa dadgehkirina DAIŞ’ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê.

**Rêbaza Lêkolînê:**

Di amadekirina vê lêkolînê de me xwe siparte rêbaza analîzî-wesifî; îcarê me ji nimayîşkirina kiryarên hovane û binpêkirinên li ser destê rêxistina DAIŞ`ê dest pê kir, paşê me analîz kirin û li gorî qanûna navdewletî ya mirovî û mafên mirov, û qanûna tawanên navdewletî wesif kirin. Her wiha em pergalên bingehîn ên dadgehên navdewletî jî analîz dikin, çi yê dadgeha Tawanên navdewletî, û çi jî yê dadgeha navdewletî ya taybet ku bi berê bi biryareke Encûmena Ewlekarîya Navdewletî ji bo darizandina sûcdarên şerê li Yugislavîyaya berê û Ruandayê hat damezirandin, ev yek jî ji bo em bizanin ka çiqasî peywir û pisporîya van dadgehan li ser sûcên ku rêxistina DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê kirine, tên cîbicîkirin û li gorî wan in.

Li gorî tişta me li jorê gotî, **me lêkolîn dabeşî du beşan kirîye**: Beşê yekem girêdayî **Danasîna qanûnî ya binpêkirinên herî mezin û girîng ên DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ye**, û di beşê duyem de, em ê behsa **dadgehên taybet ji bo darizandina sûcdarên DAIŞ`ê** bikin.

**Plansazîya Lêkolînê -Beşê Yekem:**

**Binpêkirinên DAIŞ`ê weke sûcên navdewletî**

**Derîyê yekem**: binpêkirinên DAIŞ`ê weke jenosîdeke komî.

- **Yek**: Danasîna sûcê jenosîda komî.
- **Du**: Bicihanîna jenosîda komî ji alîyê DAIŞ`ê ve.

**Derîyê duyem:** Sûcên DAIŞ`ê weke sûcên der-mirovî.

- **Yek**: Danasîna sûcên der-mirovî.
- **Du**: Bicihanîna sûcên der-mirovî ji alîyê DAIŞ`ê ve.

**Derîyê sêyem**: Binpêkirinên DAIŞ`ê weke sûcên şer.

- **Yek**: Danasîna sûcên şer.
- **Du**: Bicihanîna sûcên şer ji alîyê DAIŞ`ê ve.

**Dumahîya Beşê Yekem.**

**Beşa Yekem**

## Binpêkirinên DAIŞ`ê weke sûcên navdewletî

Gelek binpêkirin û êrîşên rêxistina DAIŞ`ê ya terorîst der heqê xelkên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de di çarçoveya sûcên birêxistinkirî û sîstematîk in, çimkî çek, topbarana ketûber û teqemenî li dijî sivîlan bi kar anîn, evê yekê hişt ku hejmareke mezin ji xelkên deverê bi darê zorê werin koçberkirin. Ev sûcên han hem kuştina bi zanebûn, hem jî jenosîd, îdamkirina meydanî, êşkenceya hovane, destdirêjî û tundîya li dijî jinê, leşkerkirina zarokan û koçberkirina bi darê zorê ya xelkên herêmê..û hwd in. îcarê, dîyar e ku ev hemû sûc dikevin çarçoveya têgîna Sûcê Navdewletî.

Sûcê Navdewletî: "ew her kiryarekî li dijî rêgezên qanûna navdewletî ya ku di deqên rêkeftinî yan jî rêkeftinên navdewletî de bicih bûye ye, yan jî ku qanûna navdewletî li serê erê kirîye, yan weke rêgezeke giştî û naskirî ji alîyê welatên şaristanî ve be, lê bi mercê ku ew sûcê han giranîya xwe hebe û bandorê li têkilîyan bike, yan jî wijdanê mirovî bihejîne"[21], her wekî sûcên jenosîda komî, sûcên der-mirovî, û sûcên şer.

Ji bo ku em asta girêdana binpêkirinên DAIŞ`ê bi têgîna Sûcên Navdewletî ve binasin, û danasîna qanûnî ya rast bidin wan binpêkirinan, gerek e destpêkê em hemû cureyên Sûcên Navdewletî binasin, û palpiştîya wan bi wêne û binpêkirinên DAIŞ`ê yên ku dikevin çarçoveya danasîna wan a qanûnî bikin, ev sûcên han çi **Sûcên Jenosîda Komî (mijara yekem)**, an **Sûcên Der-mirovî (mijara duyem)** an jî **Sûcên Şer bin (mijara sêyem).**

### Mijara Yekê: Binpêkirinên DAIŞ`ê weke Jenosîda Komî

Sûcê jenosîda komî ji sûcên navdewletî yên li dijî nijadê mirovî, ji sûcên herî xeternak e, û weke "tawana tawanan"[22] tê binavkirin, ew jî ji ber ku ev sûcê han li dijî jîyan, tenduristî û rûmerta mirov gef e, ev xeterîya han jî ji wê yekê tê ku komek mirov bi jenosîdê re rû bi rû dimînin, ew ji bi sedemên nijadî yan olî û yan jî zayendî.. û hwd.

[21] محمد أحمد علي كاسب، "المسؤولية الجنائية الدولية في ضوء القانون الجنائي الدولي"، الطبعة الأولى،2020، متوفر على https://books.google.com/books?id=3dsCEAAAQBAJ&pg=PT152&lpg=PT152&dq

[22] Heman çavkanî.

Ji bo têgihiştina tawanên jenosîdê, ku ji alîyê DAIŞê ve li herêmên di bin destê wê de hatine kirin (mijara duyemîn), divê em pêşî tawanên jenosîdê (mijara yekem) pênase bikin.

**MIjara Yekem: Danasîna sûcên jenosîda komî**

Sûcê jenosîdê yek ji tawanên herî hovane yên navdewletî ye, û asta herî mezin a hovîtîyê nîşan dide. Kesê yekem ku daxwaza krîmînalîzekirina vê kiryarê kir, hiqûqnasê polonî "Lemkin" bû, ku jê re têgîna "GENOCIDE" ya bi eslê xwe yewnanî danî. Ev têgîna han ji du peyvan pêk tê: "GENOS": kom an "nijada mirovî". "CID": Tê wateya "kuştin". û berhevoka van herdu peyvan "kuştina komekê yan nijada mirovî" ye.[23]

dibêjin ku cara yekem sûcê jenosîda nijada mirovî hat gotin, ku ew jî wateya sûcê jenosîda komî hildigire, di peymana Sêverê ya di navbera dewletên hevlabend û dewleta Osmanî de, sala 1920`an bû.[24] Di 11.12.1946`an de, di wesîyeta jimar (1/96)[25] a ku ji alîyê Komeleya giştî ya Neteweyên Yekbûyî ve encam daye, di dewreya wê ya yekem de tekezî li ser vê têgiha han kirin. Li gorî vê wesîyeta han, Komeleya giştî ev sûcê han şermezar kir û weke sûcekî qanûna navdewletî bi nav kir, û piştrast kir ku ev sûc gerek e ji alîyê cîhana şaristan ve bê protestokirin.

Gelek rengên jenosîdê hene, dibe ku razber be weke tadarîya li jîyan û tenduristîyê, yan jî bi awayekî beyolojîk be weke astengîya xwezêdekirinê û rêgirtina li ber jidayîkbûyîn û zayînê, yan jî dibe ku bi awayekî çandî be her wekî bêparhiştina komek mirov ji çand û zimanê wan.[26]

Tawanên jenosîdê di nav tawanên navdewletî de tên hesibandin  ku ji bo pêşîlêgirtin û jinavbirina wan[27] pêwîstî bi cezakirina tawanbarên wan û hevkarîya navdewletî heye, ew jî li gor Peymana Pêşîlêgirtina Tawanên

---

[23] أيمن سلامة، "المسؤولية الدولية عن ارتكاب جريمة الإبادة الجماعية"، أطروحة دكتوراه، كلية الحقوق، جامعة القاهرة، 2005.

[24] طارق أحمد الوليد، "منع جريمة إبادة الجنس البشري والمعاقبة عليها في القانون الدولي الجنائي"، دار النهضة العربية، القاهرة، ط1، 2010، ص11.

[25] Belgeya ji alîyê Komeleya Giştî ya Neteweyên Yekbûyî ve deketîye/ gera yekem. Jimar  (/RES/A1/96)

[26] حامد سيد محمد حامد، "تطور مفهوم جرائم الإبادة الجماعية في نطاق المحكمة الجنائية الدولية"، دار الكتب القانونية، مصر، 2011.

[27] Hêjayî gotinê ye ku sûcê "jenosîda komî" sûcekî serbixwe ye û ji sûcê "Jenosîdê" cuda ye, çimkî ya dawîn sûcekî der-mirovî yê sereke ye. Lêveger:
سوسن تمرخان بكة، "الجرائم ضد الإنسانية في ضوء أحكام النظام الأساسي للمحكمة الجنائية الدولية"، منشورات الحلبي الحقوقية، بيروت، ط1، 2006.

Jenosîdê ku di 12.9.1948[28] de hatîye derxistin. Xala 1. a vê Peymanê dibêje: “Alîyên Peymandar piştrast dikin ku jenosîd çi di dema aşitîyê de çi di dema şer de were kirin, li gorî hiqûqa navneteweyî sûc e û li ser rêgirtin û cezakirina wê radiwestin.” Ji ber vê yekê, û bi her halî sûcê jenosîdê sûcekî navneteweyî ye, bêyî bê zanîn ka ew kengî hatîye kirin, di dema aştîyê de yan di dema pevçûnên çekdarî de.

Di destpêka salên notî yên sedsala borî de, di encama kiryarên jenosîdê yên ku li Ruanda û welatên cîranê wê de qewimîn, li gorî biryara Encumena Ewlekarîyê (955) a 11.8.1994, dadgeha Ruanda hate damezrandin. Destûra vê Dadgeha Navnetewî ya Taybet sûcê jenosîdê bi berfirehî şirove dike. Xala duyê ya yasaya dadgeha Ruanda, jenosîdê wiha pênase dike: “Jenosîd tê wateya her yek ji van kiryarên jêrîn ku bi mebesta jiholê-rakirina tevahî an beşî, grûpek neteweyî an etnîkî, yan nijadî yan olî, wekî komek ku xwedîyê van taybetmendîyên han:

-Kuştina endamekî vê komê.

-Bizerarkirina laşî yan mejîyî ji endamên vê komê.

-Neçarkirina bi darê zorê û bi zanebûn a vê komê da ku di rewşekê de bijî û talîyê bi awayekî beşî yan jî bi giştî ew kom bi rengekî razber ji nav biçe.

-Sepandina rêkarên pêşîlêgirtina li ber jidayîkbûn û zayînê di nava komê de.

-Veguhestina bi darê zorê ji zarokên komekê bo komeke din û cuda.[29]

Li gorî heman wateyê, pergala bingehîn a Dadegha Cezayan a navdewletî ya Yugoslavyaya berê jî hat.[30]

Ji alîyê xwe ve, pergala bingehîn a dadgeha Cînayetan a navdewletî ya sala 1998`an[31] sûcê jenosîda komî wiha pênase kir: " Yek ji van kiryarên jêrîn ku bi mebesta têkbirina komeke neteweyî, etnîkî, nijadî an olî ye, bi

[28] Rêkeftina "Qedexekirina sûcê jenosîda komî û cezakirina li ser esasê wê" piştî komkujîyên ku Nazîyan di Şerê Cîhanî yê Duyem de pêk anîn hat rikandin, û ji bo îmzekirin û pesendkirin an jî tevlîbûna li biryara Komeleya Giştî ya jimar (260) –A- (D-3) di dîroka berfenbarê 1948`an de hat nimayîşkirin, her wiha di 12`ê çileyê 1951`ê de derbarsî biwarê cîbicîkirinê bû.
[29] Pergirafa duyem ji madeya duyem a pergala bingehîn ya dadgeha Rewendayê.
[30] Madeya çaran a pergala bingehîn a dadgeha tawanan ya Yugoslavyaya berê, ku bi biryara Encûmena Ewlekarîya Navdewletî ya jimar (808) di 22/2/1992`an de hat sazkirin.
[31] Madeya şeşan a pergala bingehîn a dadgeha Tawanên Navdewletî.

tevahî an beşek ji wan tê kirin: A- Kuştina endamên komê B - pêkanîna zîyanên mezin ên laşî û derûnî li endamên komê T- xistina komê di bin şert û mercên jîyanê de ku armanca wê tunekirina tam an jî parçeyî ye û bi zanebûn. C- Bi zorê veguhestina zarokên komê bo komeke din."[32]

Evê madeya han awayên jenosîda komî destnîşan kir, û tevaya wan jî pêkan in bêyî ku dema pêkhantina wan eger di dema şer an jî aştîyê de bin bê zanîn. Îcarê ev yeka han dihêle ku tevlihevî di navbera sûcên jenosîda komî û sûcên der-mirovî de encam bide. Lê tevî wê jî, jihevcudakirina van herdu cureyên sûcên navdewletî gengaz e, ew jî bi rêya liberçavstandina koma mirovî ya ku hatîye armancgirtin, çimkî sûcên jenosîda komî di derheqê komek mirov de pêk tê, bi sedemên olî, zayendî û nijadî, lê sûcên der-mirovî li dijî tevaya sivîlan bi awayekî giştî û bêserber, pêk tên, bêyî ku li ser esasê zayendî, alîgirî û sîyasî be.

Kirina her kiryarekî ji yên ku me di madeya şeşan a pergala Romayê de behs kirî de, hêmana razber a sûcê jenosîda komî pêk tîne, lê ev sûcê han bêyî hêmanê xwe yê şênber temam nabe, ku ew jî mebesta sûcî ye. Li vir, û ji bo ku mebesta sûcî ya her sûcekî were bicihanîn, gerek e du hêman li cem sûcdar peyda bibin, ew jî vîn û zanîn.[33] Anku gerek e sûcdar bi îradeya xwe û bi zanebûn jenosîdê derheqê komekê de pêk bîne, ew jî bi sedemên alîgirîyên sîyasî, olî û çandî.. û HWD. her wiha gerek e mebesta sûcî ya taybet li cemê peyda bibe, ku ew jî dikeve çarçoveya hebûna nîyeta jenosîdê li cem wî.[34]

Di derbarê hêmana navdewletî de jî, ne hewce ye ku ev hêmanê han hebe heta ku em bibêjin ku sûcê jenosîda komî encam daye, anku bi gotineke din, sûcê jenosîdê ne tenê ji hêla dewletan ve tê kirin. Ev sûcê han bi peydabûna du hêmanên sereke pêkan e, yek razber û yê din şênber e, îcarê dibe ku ji hêla dewletê ve hatibe kirin an li ser daxwaza wê yan jî bi handana wê, her wiha dibe ku ji hêla dewletekê ve yan komek kesên ku li wê dewletê dijîn li dijî komek kesên din encam bide, her wekî sûcên ku

[32] Sûcê Jenosîda Komî li gorî madeya duyem a rêkeftina pêşîlêgirtna sûcê jenosîda komî û cezakirina li ser esasê wê wiha hat pênasekirin: Çi kiryarên bên bi zanebûn werin kirin û bi mebesta jinavbirina komî yan beşî ji komeke neteweyî, etnîkî yan jî olî ji ber evê sîfetên xwe: A- Kuştina endamên komê. B- bizirarkirina laşî yan derûnî ya xeternak ji endamên komê. C- xerbakirina bi zanebûn ji jîyana komekê re bi armanca jinavbirina giştî yan beşî yaw ê komê. D- Sepandina rêkarên ku rê li ber anîna zarokan di nava komekê de digire. E- Veguheztina zarokan bi darê zorê ji nav komekê bo komeke dîtir."

[33] عبود السراج،" قانون العقوبات العام- نظرية الجريمة"، منشورات الجامعة الافتراضية السورية، 2018.

[34] أيمن سلامة، "المسؤولية الدولية عن ارتكاب جريمة الإبادة الجماعية"، أطروحة دكتوراه، كلية الحقوق، جامعة القاهرة، 2005.

Hitler di Şerê Cîhanî yê duyem li dijî neteweya Slavî[35] û ola Cihûyan[36] pêk anîn. Wek wî weke kirinên dewleta Tirk a dagirker li Efrîn, Girê Spî û Serê Kanîyê, ew jî bi rêya komên çekdar ên girêdayî wê, ev sûcên weke kuştin û koçberkirina bi darê zorê ya xelkên wan bajarên dagirkirî yên resen.

Li rêx wê yekê, gelek kirinên rêxistina DAIŞ`ê û komkujîyên wê jî dikevin çarçoveya sûcên jenosîd/qirkirina komî, bi taybet kirinên ku der heqê civaka Êzdî de, li Sûrîya û Îraqê encam dayî.

**Mijara Duyem: Piratîkîya Jenosîdên komî yên ku ji alîyê DAIŞ`ê ve pêk hatine**

Bi armanca berfirehkirina desthilatdarîya  xwe û domandina "xîlafeta" xwe, DAIŞ`ê sîyaseta sepandina tirs û xofê li herêmên di bin destê xwe de meşand, û gelek kiryarên komkujî û kuştina bi komî li dijî komên civakî li bakur û rojhilatê Sûrîyê pêk anî.

Pêkan e hin tawanên ku DAIŞê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê pêk anîne wek jenosîd bi nav bibin, bi taybetî komkujî û kuştinên bi komî ku wê li dijî kurdan li Kobanî, û li dijî "El-Şiîtat" li Dêra Zorê û civaka êzdî pêk anî.

**Yek: Komkujîya Kobanîyê:** ev komkujî ji yên herî hovane yên ku der heqê gelê Kurd de ji hêla sûcdarên DAIŞ`ê ve pêk hatîye ye. Di 25`ê hezîrana 2015`an, Çekdarên DAIŞ`ê ev komkujî pêk anîn, bêhtirî 200 sivîlên bêçek li bajarê Kobanîyê (gunderwarê Helebê) bûn qurban û bêhitrî 250 kes, di nav de jin û zarok[37] bi guleyên rasterast birîndar[38] bûn, û li gorî Rewangeha Sûrî ya mafên mirov, 148 kes li bajarê Kobanîyê bixwe hatin kuştin, û vê dawîyê 32 term, piştî bidawîbûna şer, li heman bajarî hatin dîtin. Her wiha sûcdarên DAIŞ`ê êrîşî gundê Berxbatan li gundewarê bajêr kir û derdora 26 sivîl, di nav de jin û zarok, hatin kuştin. Li gorî şahdhalên ji devera komkujîyê, sûcdarên DAIŞ`ê ti ferq nedikirin navbera zarok, mezin, bav, dayîk û kur. Di encama evê komkujîyê de 37

---

[35] موسوعة وكيبيديا الإلكترونية، https://ar.wikipedia.org/wiki

[36] موقع بي بي سي عربي،" الهولوكوست أو المحرقة اليهودية: ماذا نعرف عنها؟"، 23 كانون الثاني 2020، آخر تحديث:21 كانون الثاني 2022

[37] نورث برس، "مجزرة كوباني.. تفاصيل لا تنسى ومطالبات بتحقيق العدالة"،https://npasyria.com/157160/، آخر زيارة: 2023/9/20.

[38] المرصد السوري لحقوق الانسان، "راح ضحيتها نحو 206 من المدنيين.. الذكرى السنوية الثامنة لمجزرة مدينة عين العرب (كوباني) على يد عناصر تنظيم "الدولة الإسلامية"،https://www.syriahr.com، أخر زيارة 2023/9/20.

zarok û 77 jin[39] bûn qurban. Li nik wê, 16 şervanên Hêzên Parastina Gel û Asayîşê şehîd bûn.[40]



**Goristana şehîdên komkujîya Kobanîyê- Jêder: Ajansa JINHA`yê**

**Du: Komkujîya Şiîtatê**: ev komkujî ji hêla DAIŞ`ê ve di der heqê eşîreya Şiîtatê de, li gundewarê Dêra Zorê, encam da, ji ber ku herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê, ku piranîya xwe xwedî civakên êl û qebelî ne, li pêş hukimê rêxistina "Dewleta Îslamî" astengî bûn. Ev komkujî di tebaxa 2014`an de[41], li nêz bajarokê Mûhesenê, li bajarokên Ebû Hemam, El- Keşka û Xeranîcê çêbû, ku li wir gelek êrîşên bi zanebûn pêk hatin, û berîya wan topbaran û moşekbaran[42] encam dan, her wiha çi xortekî di temenê karîna şer de û ji heman eşîreyê  bû, bi awayekî komî hatin îdamkirin.[43]

Li gorî texmînan, bêhtirî 1000 kuştî ji Şiîtatan di rûbirûbûna bi DAIŞ`ê re de çêbûn, di nav de 50 sivîlên ku ji cihê karê wan, li zevîyê El-Tenk ê petrolê, li rojhilatê Dêra Zorê hatibûn revnadin.[44] Li rex evê komkujîyê, gund û bajarok hatin şewtandin, mal û milk hatin desteserkirin, her wiha DAIŞ`ê rê li ber vegera xelkê girt, û yên hatibûn koçberkirin jî jê

---

39 نورث برس، "مجزرة كوباني..."، مرجع سابق.

40 Çekdarên DAIŞ`ê du caran derbasî bajarê Kobanîyê bûn û cilên Yekîneyên Parastina Gel (YPG) li wan bû. Lêveger:

المرصد السوري لحقوق الانسان، مرجع سابق.

41 الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

42 عمر أبو ليلى "مجزرة داعش المنسية في دير الزور"، متوفر على العنوان التالي:
https://www.washingtoninstitute.org/ar/policy-analysis/mjzrt-dash-almnsyt-fy-dyr-alzwr

43 تقرير الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS)، " تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

44 عمر أبو ليلى "مجزرة داعش المنسية في دير الزور"، مرجع سابق.

nefilitîn[45], her wiha çi kesê li gund û bajarokên li derdora herêmê dihatin dîtin, yekser dihatin kuştin.[46]




**Komgorek Li gundê Cemma yê rojhilatê Dêre Zorê, tê de hin qurbanîyên Komkujîya Şiîtatê hene – North Press**

**Sê: Komkujîya gundê Tilîlîyê**: Di 29`ê gulana 2014`an de, çekdarên rêxistina DAIŞ`ê bi ser gundê Tilîlîyê de, li başûr rojavayê bajarê Serê Kanîyê, li gundewarê Hesekê de girtin, li vî gundê han kurdên êzdî û erebên sunî yên bi eslê xwe ji herêma El-Sifîra, li gundewarê Helebê, bûn. Biserdegirtin di çarçoveya şerê di navbera rêxistina DAIŞ`ê û Yekîneyên Parastina Gel YPG`ê de, li derdora gund û li gundên derdeor encam da. Piştî ku çekdarên DAIŞ`ê bi ser gund de girtin, bi awayekî bêserûber, û ji nêz ve gule li xelkên gund reşandin, di nav de zarok û jin û bi awayekî komî ew kuştin.[47] Ji vê bûyera han dîyar dibe ku rêbazekî plankirî yê kuştina bi sedemên nijadî û etnîkî dihat meşandin, nemaze ku

[45] Di 6ê çirêya paşîna (November) 2014ê de, raportan dîyar kirin ku serkirdeyê DAIŞê Ebûbekir el-Bexdadî daxuyanîyek belav kir û tê de destûr da endamên eşîra Şeitat ku vegerin malên xwe, bi şertê ku kom nebin, bi ser hev de necivin, û hemû çekên xwe radestî wan bikin û gelacîya "Murtedînan" bikin û agahîyan li ser wan bidin "Rêxistin"ê. Her wiha got: tevaya "Xayînan" dê wein kuştin. Li Raporta Neteweyên Yekbûyî vegere:
تقرير الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.
.
[46] Hêjayî gotinê ye ku kesê bi navê Ebû Ebdullah El-Kuweytî fetwayek derxist û tê de xelkê El-Şîtat weke komeke "kafir" û "komeke ku bi rêya çekan red dike ku pabendî desthilatdarîya îslamî bibe" da. Di berdewamîya axaftina xwe de wiha got: "Ne bi pere û ne jî bi rê û rêbazên din bi wan re girêbesta agirbestê û berdana esîrên wan qedexe ye, xwarina goştê ajalên ku serjê dikin qedexe ye. Nabe bi jinên wan re bizewicin, û gerek e kesên ku ji destê wan direve û di nav wan de birîndar dibe were kuştin, her wiha eger ew şerê me nekin jî gerek e em şerê wan bikin. " lêveger:
راجع عمر أبو ليلى "مجزرة داعش المنسية في دير الزور"، مرجع سابق.

[47] الشبكة السورية لحقوق الانسان، " محرقة المجتمع: أبرز المجازر التي تحمل أنماط انتهاكات طائفية أو عرقية في سوريا"، 13 حزيران 2015، تمكن فريق الشبكة السورية من توثيق مقتل 15 مدنيا بينهم 7 أطفال و3 سيدات معظمهم من بلدة السفيرة ممن يعملون بالزراعة.

DAIŞ civaka êzdî ya kurdî kafir dibîne, û rêûresmên wan ên olî jirêderketî hisab dike.[48]



**Qurbanîyên komkujîya gundê Tilîlîyê- Reuters**

**Çar: Jenosîda kêmara êzdî**: Li gor raporta Komîsyona Navdewletî ya Serbixwe ya ji bo Sûrîyayê, 16`ê Hezîrana 2016an, DAIŞê jenosîd li dijî êzîdîyan pêk anî[49]. Piştî destpêkirina êrîşên li ser Şingalê (bakurê Iraqê), DAIŞê bi darê zorê êzîdî veguhestin Sûrîyayê, û vê rêxistina terorîst tawanên herî hovane li dijî kêmara êzîdî pêk anîn, û dixwest bi gelek awayan wan tune bike, ku di Peymana Pêşîlêgirtin û Cezakirinê ya sala 1948`an de weke sûcê jenosîdê hatine destnîşankirin.[50]



**Hin êzdî li ber goreke komî ya ku xizmên wan ên li ser destê DAIŞ`ê hatin kuştin tê de veşartî ne- AFP**

Di vê raporta Netewên Yekbûyî de hate gotin ku “DAIŞ bi kuştin, koletîya seksî, kolekirin, êşkencekirin, danûstandina biçûkxistinê û nemirovane, her wiha bi koçberkirina bi darê zorê ku bû sedema zîyanên derûnî û fizîkî, xwest êzîdîyan ji holê rake. şert û mercên jîyanê yên nebaş, ku mirina hêdî bi xwe re anî, û bikaranîna rêyên ku rê li ber

48 الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS)، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

49تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا،"داعش ترتكب جرائم الإبادة الجماعية ضد الإيزيديين"، رقم A/HRC/32/CRP2، 16 حزيران 2016.

Ev raport balê dikişîne ser binpêkirinên rêxistina DAIŞ`ê der heqê Êzdîyên li Sûrîyayê.

50 أحلام داود الشعشاع، "الحماية الدولية للأقليات اثناء النزاعات المسلحة- دراسة تطبيقية على الأقلية الإيزيدية"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية السورية، 2020.

jidayikbûna zarokan digire li wan ferz kir. Di nav de, hişt ku zarokên êzîdî bi darê zorê ola xwe biguherînin û bibin misilman, û ew ji malbatên wan bi dûr xistin. Endamên DAIŞ'ê bi vî awayî wan ji bawerî û ayînên civaka wan vediqetînin." Ew kesên ku red kirin ola xwe biguherînin da ku nasnameya wan a Êzidî tune bike, kuştin. Nasnameya etnîkî, neteweyî, nijadî an olî[51] ya qurbanîyên tawanên jenosîdê, stûna bingehîn a vê cureyê tawanên navneteweyî ye.[52]

Bê guman em di van tawanên DAIŞê û yên din de dibînin ku ew bi gelek şêweyên tawanên jenosîdê[53] re hevaheng in, nemaze ku hêmana maddî ya tawana jenosîdê tê wateya her kiryara ku bi rêya wê bi tevahî yan beşekî ji komeke mirovî ya neteweyî, olî, an nijadî, bi awayên sûcdar ên ku bi kuştina endamên komê têne temsîlkirin, ji holê rake.[54]

Komkujîyên ku ji alîyê DAÎŞê ve li dijî kurdan bi giştî, êzîdî û kêmarên din ên li bakur û rojhilatê Sûrîyê hatine kirin, digihêjin asta sûcê jenosîdê ku li gorî yasayên tawanên navneteweyî[55] tê cezakirin. Di heman demê de, ew binpêkirinên cidî yên qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî ne, nemaze xala 3`an a Danezana Cîhanî ya Mafên Mirovan a sala 1948[56], ku dibêje "Her kes xwedî mafê jîyan, azadî û ewlehîya kesane ye."[57]

## Beşê duyem: Sûcên rêxistina DAIŞ`ê weke sûcên der-mirovî

Di van demên dawîn de, sûcên der-mirovî di qada hiqûqa tawanên navneteweyî de cih girtin, her çendî koka wan a dîrokî ya kûr heye jî[58], ji

[51] Hêjayî bibîrxistinê ye ku ev kirinên han digihêjin asta sûcên der-mirovî û sûcên şer. Paşê li rûpelên 16-25 binêre.

[52] Ev tişta ku Şêwirmendê Taybet ê Sekreterê Giştî yê Rêxistina Neteweyên Yekbûyî (NY) ji bo pêşîlêgirtina jenosîda komî *Adama Dieng* û şêwirmenda taybet a sekreterê giştî li ser berpirsîyarîya parastina rewşa Iraqê *Jennifer Welch* di daxuyanîya xwe ya roja 12`ê Tebaxa 2014`an de de dîyar kirin. Di wê daxuyanîyê de wan tekez kir ku DAIŞê gelek kiryar û tawan li dijî mezhebên êzîdî, mesîhî û şebek kirine, ku dibe ku bibe jenosîda komî.

[53] Gelek welatan sûcê jenosîda komî ya di der heqê Êzdîyan de nas kir, her wekî Almanya û Brîtanyayê.

[54] علي وهبي ديب،" المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، منشورات الحلبي الحقوقية، بيروت،2015.

[55] أحلام داود الشعشاع، "الحماية الدولية للأقليات اثناء النزاعات المسلحة- دراسة تطبيقية على الأقلية الأيزيدية"، مرجع سابق.

[56] راجع: ياسر الحويش، مهند نوح،" حقوق الانسان"، منشورات الجامعة الافتراضية السورية، 2018.

[57] Li gorî biryara Komeleya Giştî (217) hezar (D-3) dîroka 10`ê çileyê 1948`an Ragihandina Cîhanî ya mafên mirov hat erêkirin.

[58] Di pêşgotina Peymana Laheyê ya sala 1907an de û di biryarên Konferansa Dewletên Amerîkayî de ku di sala 1902an de li Rio de Janeiro hat lidarxistin de, her wiha Peymana Sêvrê di sala 1920an de, ku li gor vê peymanê Tirkîya pabend e hemû berpirsên komkujî, bi taybetî jî kuştina ermenan di şerê cîhanê yê yekem de, radestî welatên hevpeyman bike.

ber ku ew di xala pêncan a qanûna 1998`an[59] a Dadgeha Tawanan a Navneteweyî de hatine destnîşankirin. Di Danezana cîhanê ya Mafên Mirovan, a sala 1948’an de wêneyên van sûcan[60] jî cih girtin.

Berî lêkolînkirina tawanên ku ji alîyê DAIŞê ve hatine kirin wek tawanên der-mirovî (pêwîstîya duyem), pêwîst e destpêkê tawanên der-mirovî bi rêya metnên yasayî yên ku hatine destnîşankirin (pêwîstîya yekem) bên dîyarkirin.

## Mjiara Yekem: Danasîna Sûcên Der-mirovî

Sûcên der-mirovî wekî "sûcên ku êrîşeke eşkere li dijî mirovan pêk bê, di nav de kuştin, qirkirin, koletî û her kiryara din a nemirovî ya ku berîya şer û di dema şer de li dijî sivîlan tê kirin e." Tên pênasekirin[61]. Xala 7`an a Destûra Dadgeha Cezayê ya navdewletî ya sala 1998an sûcên der-mirovî wiha pênase dike: “Ji bo armanca vê pergalê, her yek ji kiryarên jêrîn sûcê der-mirovî ye dema ku di çarçoveya êrîşek berbelav û sîstematîk a ku li dijî her komek kesên sivîl bi zanebûn tê kirin: A - Kuştina bi plan. B – Qirkirin. C – Koletî. D - Sirgûnkirin an bi darê zorê veguhestina xelkê. C - zindankirin an jî bêparkirina giran ji azadîya fîzîkî ku li dijî rêgezên bingehîn ên hiqûqa navdewletî ye. H – êşkence. G - Tecawiz, an koletîya zayendî, an fuhûşa bi darê zorê, ducanîbûna bi darê zorê, bêdûndeyîya bi darê zorê, an her şêwazek din a tundîya zayendî ya bi vî rengî. D - Zordestkirina komek an komek taybetî ya xelkê ji ber sedemên sîyasî, nijadî, neteweyî, etnîkî , çandî an olî yan jî bi zayenda ku di Paragrafa. (3)[62] de hatî destnîşankirin ve girêdayî ye, yan jî ji ber sedemên din yên ku bi awayekî giştî qanûna navdewletî napejirîne, her wekî kiryarên girêdayî vê paragerafa han an her sûcekî dikeve çarçoveya peywira dadgehê de. Y- wendakirina kesan bi dare zorê. T- Sûcê cudakirina bi

[59] Li gorî madeya 5`an a Pergala Bingehîn a Dadgeha Tawanên Navdewletî ya sala 1998`an: Ji peywir û pisporîya dadgehê ye ku evan sûcên han li ber çavan bistîne, ew jî li gorî vê Pergala Bingehîn: B- Sûcên der-mirovî…….".

[60] Madeya 4. ya Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan dibêje: “Nabe Tu kes were kolekirin û bendekirin û bazirganîya koleyan bi hemû şêweyên xwe qedexe ye.” Madeya pêncan jî dibêje: “Nabe ku tu kes rastî êşkence û muameleya hovane, nemirovî û biçûkxistinê bê.” Di madeya 9’an de jî wiha tê gotin: “Tu kes nikare bi awayekî keyfî bê girtin, binçavkirin û sirgûnkirin.” Di madeya 12’an de jî tê gotin: “Nabe tu kes bi awayekî keyfî di jîyana xwe ya taybet, malbat, mal û nameyên xwe de rastî destwerdana kêfî were, yan jî êrîş li ser namûs û îtîbara wî were kirin.”

[61] سوسن تمرخان بكة، "الجرائم ضد الإنسانية في ضوء أحكام النظام الأساسي للمحكمة الجنائية الدولية"، منشورات الحلبي الحقوقية، بيروت، ط1، 2006.

[62] Pargrafa 3`an ji madeya 7`an a Pergala Bingehîn a Dadgeha Tawanên Navdewletî ya sala 1998`an, da xuyakirin ku derbirîna "Cûreyên Zayend" herdu zayendan; mê û nêr, di çarçoveya civakî de, di nava xwe de dihewîne, û îşaretê bi wateyeke din a berûvaj nake.

awayekî nijadperestî. G- kiryarên dermirovî yên ku bi zanebûn tên kirin û zîyaneke mezin didin laş an tendursitya mejî yan jî ya bedenî".[63]

Balkêş e ku ev maddeya ku li jor me behs kirî, şêweyên tawanên dermirovî dîyar dike, bi awayekî ku pêkanîna her yek ji wan kiryarên ku tê de hatine behskirin, hêmana maddî ya tawanên dermirovî pêk tîne. Lê belê ji bo ku her sûcek biqede, divê hêmana razber jî hebe, ku awayê nîyeta sûc digire, û nîyeta sûc ji hêmanên zanîn û îradeyê pêk tê[64]. Ango divê kesê sûcdar xwedî zane û îrade be ku kiryara wî çewsandin an êrîşkirina komeke mirovî ye, di heman demê de divê xwedîyê nîyetek sûcdar a taybetî be, ku nîyeta tunekirina wê komê ye, di encama bawerîyên wan ên olî, etnîkî, nijadî an çandî de, ev yek ji bilî nîyeta sûcê ya giştî.

Her wiha ji metinê madeya heftan ji pergala bingehîn a Dadgeha Tawanên Navdewletî dixuye ku divê ev herdu mercên bên peyda bin, ji ber ku binpêkirinên der heqê mirovahîyê de, sûcên der-mirovî ne: Ji alîyekî ve gerek e kiryarên ku sûcên navdewletî ne li dijî tevaya sivîlan pêk bên, û sîfeta kesê ku ev kiryar kirine çi be bila bibe, eger leşkerekî fermî be yan ji komeke çekdar be. Lê, ji alîyekî din ve divê ev kirinên han parçeyek ji zîyanên berfireh an ên birêxistinkirî bin, anku divê gelek qurbanîyan bike armanc.

[63]Paragrafa duyemîn a Benda Heftemîn a Qanûna Romayê ya Dadgeha Tawanan a Navdewletî ya 1998, wateya hin cûreyên sûcên li der-mirovî dîyar dike, wekî ku dibêje: "Ji bo mebesta Paragrafa (1): (a) îfadeya "êrîş ku li dijî her nifûsa sîvîl tê arastekirin" tê wateya nêzîkbûnek reftarî Komîsyonek dubare ya kiryarên ku di paragrafa (1) de li dijî her nifûsa sivîl li gorî an ji bo pêşdebirina sîyasetek dewletî an rêxistinî ku pêkanîna êrîşek weha hewce dike ” ferzkirina bi qestî şert û mercên jîyanê, di nav de nehiştina gihandina xwarin û dermanan. Bi mebesta tunekirina beşek ji nifûsê Li ser kesekî, di nav de bikaranîna van desthilatan bi armanca bazirganîya mirovan, bi taybetî jin û zarokan. qada ku ew bi awayekî qanûnî tê de ne, bi dersînorkirin an jî her kiryareke din a bi darê zorê, bêyî hincetên ku ji hêla qanûnên navneteweyî ve têne destûr kirin çavdêrîkirin an jî kontrolkirina tawanbaran, lê êşkence ti êş û azarên ku tenê ji ber, bûna beşek an jî di encama cezayên qanûnî de çêdibin, tê de nîne. F - "Ducanîya bi darê zorê" tê wateya bi darê zorê li ser jinekê ji bo ducanîyek bi zorê an jidayikbûnek neqanûnî bi mebesta ku bandorê li pêkhateya etnîkî ya her nifûsê bike an binpêkirinên din ên cidî yên hiqûqa navneteweyî pêk bîne, û bi ti awayî nabe ku ev pênase bi vî rengî were şîrove kirin. binpêkirina qanûnên neteweyî yên têkildarî ducanîyê "Zulm" tê wateya bêparkirina bi mebest û tund ji mafên bingehîn di komek an komê de, li dijî qanûnên navneteweyî, li ser bingeha nasnameya komê yan ya grûpê. h - "Sûcê apartheid" tê wateya her kiryareke nemirovane ku bi karakterê wan kiryarên ku di paragrafa (1) de hatine behs kirin û di çarçova pergalek sazûmanî ya zordestî û kontrolkirina sîstematîk de ji hêla komek nijadî ve li hember her komeke din tê kirin. kom an komên nijadî, û bi mebesta domandina wê pergalê pêk tê. i - "Windakirina bi zorê ya kesan" tê wateya girtin, binçavkirin an revandina her kesî ji hêla dewletek an rêxistinek sîyasî ve, an jî bi destûr, piştgirî an razîbûna wê di vê kiryarê de, û paşê erênekirina wê ji pejirandina bêparkirina van kesan ji azadî yan jî agahdarkirina li ser çarenivîsa xwe yan jî cihê wan, bi mebesta bêparkirina wan ji parastina qanûnê bo demeke dirêj.”

[64] عبود السراج،" قانون العقوبات العام- نظرية الجريمة"، مرجع سابق.

Ev mercên li jorê me gotî di binpêkirinên rêxistina DAIŞ`ê yê der heqê sivîlên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de peyda ne. di vê derbarê de, Encûmena Ewlekarîya Navdewletî tekez kir ku rêxistina DAIŞ`ê gelek cureyên binpêkirin û zîyanan kirine, ku dibe bighêjin asta sûcên der-mirovî. Ev sûcên han hem îdamkirina komî, tepeserîya pêkhateyekê li ser esasê bawerîya wê ya olî, yan mezhebî, revandina sivîlan, derbederkirina kêmneteweyan, destdirêjî sêksî, binçavkirina bêserûber û hwd in…[65]

**Mijara duyem: Awayên sûcên der-mirovî yên ji alîyê rêxistina DAIŞ`ê ve hatine kirin**

Ji dema derketina DAIŞê weke rêxistineke terorîst a çekdar li Iraq û Sûrîyayê, û ji bo ku civakan bike bin serwerîya xwe, kiryarên kuştin û wêrankirinê weke çekekê bikar tîne da ku bigihe armancên xwe, di nav de belavkirina tirs û xofê li navçeyên qaşo "Xîlafet"a wê. Vê rêxistinê gelek tawanên navdewletî pêk anîne, bi taybet tawanên ku digihêjin asta der-mirovî, ji ber ku pêkhateyên etnîkî û olî yên bakur û rojhilatê Sûrîyê rastî xirabtirîn cureyên van tawanan hatine.

Endamên rêxistina terorîst a DAIŞê tawanên kuştin, revandin, destavêtin, koçberkirin, tundûtûjîya zayendî û laşî, her wiha bazirganîya jin û zarokan, leşkerkirina bi darê zorê, û wêrankirina cihên girîng ên olî û çandî pêk anîn. Piranîya van sûcan di çarçoveya têgiha sûcên der-mirovî de ne.[66]

**Yek- Kuştina bizanebûn**: Yek ji sûcên der-mirovî yên herî xeternak e, ew bixwe komek kirîyarên li dijî kesekî yan komek kesên sivîl e. dibe ku dewletek pê rabe, yan jî bi rêya komek kes di ber sîyaseta ku ew kom dimeşîne de be[67]. Kuştina bizanebûn weke sûcekî der-mirovî ji kuştina bizanebûn a sûcê jenosîda komî cuda ye, ji ber ku ya dawîn kesên komek kesên destnîşankirî armanc digire, û sedem jî li meylên neteweyî yan etnîkî yan olî vedigere, lê sûcê kuştina bi zanebûn a der-mirovî ne mîna

[65] Biryara Encûmena Ewlekarîya Navdewletî ya hejmara (2170) ya sala 2014an, tê de destnîşan kir ku Encûmena Ewlekarîya Navdewletî di heyama 15 mehan de 6 biryar derbarê tawanên DAIŞê derxistîye, ew jî: Biryara jimare (2178) ya 24ê Îlona 2014ê û biryara jimare (2195) ya 19ê çileya pêşîna 2014ê, biryara hejmar (2199) ya 12ê sibata 2015ê, biryara jimare (2214) ya adara 2015ê û biryara jimare (2249) ya 20ê çirîya paşîna (November) 2015ê. Encûmena Ewlekarîyê her wiha tekezî li ser cezakirina DAIŞê û El Nusrayê kir.

[66] Madeya 7`an a Pergala Bingehîn a Dadegeha Tawanên Navdewletî ya sala 1998`an.

[67] محمود الشريف بسيوني، "المحكمة الجنائية الدولية-نشأتها ونظامها الأساسي"، الطبعة الثانية، مطابع روز اليوسف الجديدة، القاهرة، 2002.

wê ye, lê belê komek xelekên sivîl dike armanc bêyî cudahî û bi awayekî biplan û birêxistinkirî.

Rêxistina terorîst a DAIŞê di çarçoveya berdewamîya êrişa berfireh li ser xelkên sivîl, armanckirina deverên sivîl û sivîlan bi bombekirin û operasyonên xwekujî yên bêserûber bi bikaranîna bombeyên teqemenî, otombîlên bombekirî, binçavkirin û windakirina sivîlan û jinavbirina wan di bin êşkenceyê de, sîyaseta kuştina nerewa û ne qanûnî pejirand. [68]

DAIŞ'ê gelek êrîşên xwekuj li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê pêk anîn û di encamê de bi dehan sivîlan jîyana xwe ji dest da, di mijdara 2016'an de xwekujekî DAIŞ'ê xwe li kolaneke sereke ya Tel Ebyadê (Parêzgeha Reqayê) teqand û di encamê de 5 sivîl hatin kuştin, di nav de 3 zarok hebûn[69]. Di kanûna 2015an de, rêxistinê bi koordîne û gelek operasyonên bombebarkirî li bajarokê Til Temrê (parêzgeha Hesekê) pêk anîn, ku tê de êrîşek bi mebest bi sê kamyonên bombebarkirî pêk anî û di encamê de herî kêm 50 kes hatin kuştin û 80 sivîlên din jî birîndar bûn[70]. Her wiha DAIŞê di Cotmeha 2016an de salona dawetekê li bajarê Hesekê bi êrîşeke xwekuj (Hola El-Senabel, li ser rêya Qamişlo û Hesekê ye) kir armanc. Xwekujekî xwe di salona dawetê de teqand, û nêzîkî 30 sivîl hatin kuştin û bi dehan kes jî birîndar bûn[71]. Di dawîyê de, di 27ê Hezîrana 2016an de, DAIŞê du teqînên xwekuj bi rêya kamyoneke bombekirî û motorsîklêteke mezin li taxa Xerebî ya bajarê Qamişlo (Parêzgeha Hesekê) pêk anî. Ev teqîn weke tundtirîn operasîyonên xwekuj ên DAIŞê tê dîtin, ji ber ku nêzîkî 50 kesan jîyana xwe ji dest da, bi dehan sivîlên bêçek birîndar bûne, û wêranîyeke mezin li avahî û dikanên derdorê ket[72] û piştre DAIŞê berpirsatîya vê teqînê li xwe girt[73]. Ji ber ku di çarçoveya êrîşeke birêkûpêk û berfireh de li dijî sivîlan tên kirin, mirov dikare van êrîşên xwekuj weke sûcên der-mirovî bi nav bike.

---

68 تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، A/HRC/31/68، 11 شباط 2016.

69 Heman çavkanî.

70 صحيفة الشرق الأوسط،" 50 قتيلاً في تفجيرات انتحارية تبناها «داعش» في تل تمر بسوريا"، 11 كانون الأول 2015، آخر تحديث 11 تشرين الثاني 2015، متوفر على العنوان التالي: https://aawsat.com/home/article/517331/50-

71 قناة العربية، "انتحاري يفجر نفسه في حفل زفاف بالحسكة"، نشر في 3 تشرين الأول 2016، آخر تحديث 20 اب 2020، متوفر على العنوان التالي: https://www.alarabîya.net/arab-and-world/syria/2016/10/03

72 قناة فرنسا 24، "سوريا: عشرات القتلى والجرحى في تفجيرين انتحاريين بالقامشلي"، متوفر على العنوان التالي: https://www.france24.com/ar/20160727-

73 DAIŞê bi rêya ajansa xwe ya "Amaqê" berpirsyarîya teqînê girt ser xwe.
راجع قناة الجزيرة "انفجار ضخم بالقامشلي يوقع دماراً وعشرات القتلى"، متوفر على العنوان التالي: . https://www.aljazeera.net/news/2016/7/27/

**Du- Jenosîd:** Sûcê "jenosîd"ê wek tawaneke der-mirovî, bûyerên kuştina komek kesên taybet ku taybetmendîyên wan ên hevpar nînin, çi etnîkî, olî, an neteweyî, dike armanc. Ji ber vê yekê, ev sûc ji sûcê "jenosîdê" ku di benda 6-ê ya "Hevpeymana Romayê ya bingehîn" de hatî destnîşan kirin, ku tê de komek taybet divê ji ber sedemên nijadî, olî, an neteweyî were armanckirin, cuda dibe.[74]

Ji alîyekî din ve, tawana jenosîdê dikare weke tawaneke der-mirovî bi awayên curbicur ên kuştinê, çi bi awayekî rasterast an nerasterast, pêk were wek: ferzkirina şert û mercên jîyanê yên dijwar, her wekî bêparkirina ji xwarin û dermanan, bi mebesta tinekirina beşek ji xelkê. Di vê derbarê de, DAIŞ`ê dorpêçeke demdirêj li ser hin bajarên bakur û rojhilatê Sûrîyê ferz kir, û stratejîya bêparkirina sivîlan ji xwarin, pêdivîyên bijîşkî û alîkarîyên mirovî meşand. Her wiha, DAIŞê taxên pir niştecih ku ji sala 2014`an heta 2017`an[75] ji alîyê hikûmeta sûrî ve li bajarê Dêra Zorê hatibûn kontrolkirin, dorpêç kirin. Îcarê Nebûna xwarin, av û dermanan bûn sedema kêmxwarinî û mirina giran di nav kesên xizan û lawaz de, di nav de zarok, kal û pîr û kesên xwedî pêdivîyên taybet.[76]

Li rex wê yekê, rêxistinên mirovî jî nedikarîn xwe bigihînin derdora (600) hezar kesî li parêzgehên Dêra Zorê û Reqayê, di dema ku ev herêm li jêr kontrola rêxistina DAIŞ`ê bû. Her wiha li parêzgeha Hesekê, DAIŞ`ê xebatên bijîşkç û karmendên tenduristîyê yên hawirdekirina dermanan asteng dikirin.[77]

Her wiha, DAIŞ`ê di 7ê Kanûna 2013`an de bajarên kurdan li gundewarê Helebê (Efrîn-Kobanî)[78] dorpêç kir û rê li ber anîna xwarin, pêdivîyên bijîşkî û sotemenîyê girt.[79]

Li gel ku ev kiryar ji hêla navdewletî ve qedexe ne û em dikarin wan weke tawana jenosîdê bi nav bikin, ji ber sûcên der-mirovî ne, li rex wê

[74] Me berê li ser sûcê jenosîdê wek cureyek ji sûcê navdewletî lêkolîn kir, di madeya 6`an a Pergala Romayê de hatî behskirin, lê vegere.

[75] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، A/HRC/31/68 11 شباط 2016

[76] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، الأمم المتحدة، الجمعية العامة، مجلس حقوق الانسان 21A/HRC/46/54 كانون الثاني 2021

[77] الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[78] الشبكة السورية لحقوق الانسان، "تنظيم دولة العراق والشام: نشأته وتوثيق لأبرز الانتهاكات التي قام بها"، 2014، www.sn-hr.org، الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[79] الشبكة السورية لحقوق الأنسان، "تنظيم دولة العراق والشام: نشأته وتوثيق لأبرز الانتهاكات التي قام بها "، مرجع سابق.

ev binpêkirinên li dijî rêzgezên qanûna navdewletî ya mafên mirov in jî[80]. Her wekî mafê jîyanê, qedexeya tekez a êşkenceyê, danûstandina hişk, ne mirovî û ne exlaqî, mafê azadîya veguheztinê, mafê jîyîna di asteke hêja de, di nav de asta guncaw a xwarin, cil, niştecihî, û mafê guhdana tenduristî ya bingehîn her wekî dermanên bingehîn.[81]

**Sê- Bidurxistin an veguhestina xelkê ya bi zorê:** Qanûna navdewletî veguhestina bi darê zorê yan bidûrxstina xelkê sivîl ji devera ku ew bi qanûnî tê de ne, çi ji welatê wan yan jî ji bo welatekî din, çi bi zorê yan jî bi gefxwarinê tên mecbûrkirin, qedexe dike. Di vê derbarê de, di dirêjahîya serdeman de, cîhan di gelek qonaxên dîroka xwe ya dirêj de, nemaze di dema şerên çekdarî de, bûye şahidê dersînorkirinên mezin ên xelkê sivîl. [82]

Di rewşa alozîya Sûrîyê de, DAIŞê li navçeyên ku di bin kontrola wê de, kêmarên neteweyî, olî û etnîkî[83] ji cih û warên wan dan koçberkirin, bi darê zorê ji hev belav kirin yan jî asmîle kirin[84]. Kurd di Tîrmeha sala 2013`an de bi darê zorê ji malên xwe li Reqayê hatin koçberkirin û her wiha ji wan hat xwestin ku ji bajarê Til Ebyad/Girê Spî (Parêzgeha Reqa) derkevin an jî bi mirinê re rû bi rû bimînin[85]. Di encamê de malbatên tirkmen û ereb jî di nav de bi hezaran sivîl revîyan. Endamên DAIŞê bi awayekî sîstematîk mal û milkên kurdan talan û wêran kirin, û di hin rewşan de malbatên erebên sunnî yên ku ji herêmên Qelemonê (Gundewarê Şamê), Reqa û Dêra Zorê hatibûn ji nû ve li deverên ku ji kurdan hatibûn valakirin bi cih kirin. Heman tişt li Til Eran û Til Hasilê[86] jî encam da. Her wiha vê rêxistina terorîst di Mijdara 2014an[87] de jî berda kurdan ji bajarê Babê (parêzgeha Helebê). Ev kiryarên ku bi şêweyê

---

[80] ياسر الحويش، مهند نوح،" حقوق الانسان"، مرجع سابق.

[81] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، الأمم المتحدة، الجمعية العامة، مجلس حقوق الانسان، 21A/HRC/46/54 كانون الثاني 2021، فقرة 45.

[82] سوسن تمرخان بكة،" الجرائم ضد الإنسانية في ضوء النظام الأساسي للمحكمة الجنائية الدولية"، مرجع سابق.

[83] الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[84] مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13، وتقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[85] مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

[86] الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[87] تقرير مجلس حقوق الانسان (a/hrc /28/69 ) شباط 2015 ، ص 13، فقرة 39.

êrîşeke sîstematîk û berbelav li dijî gelê Kurd yê sivîl tên kirin, dibin tawana koçberkirina bi darê zorê ku tawaneke der-mirovî ye.[88]

Li nik vê yekê, koçberkirin û derbederkirina bi darê zorê û veguhestina êzîdîyan ji cihê wan yê resen li Şengalê (bakurê Iraqê) ber bi bajarên bakur û rojhilatê Sûrîyê[89] ve jî weke sûcê koçkirina bi darê zorê tê dîtin.

**Çar- Zindankirin an girtin:** piştî ku DAIŞ`ê bi awayekî bilez rûbereke berfireh ji xaka Sûrîyayê kontrol kir, êdî dest bi avakirina toreke berfireh ji girtîgeh û zindanan ava kir, da ku çi kesê ji rêya wê derkeve yan jî hukimê wê red bike were cezakirin, bi taybet li parêzgehên Reqa û Dêra Zorê û Helebê, her wekî zindana "Nuqte 11" ku navûdengîya wê gelek xerab e, û dibistana Mûawîyayê (parêzgeha Reqayê).[90]

Qanûna navdewletî ya mafên mirov[91] û qanûna mirovî ya navdewletî[92] pêgirîyên zelal li tevaya alîyên şer ên ne-navdewletî ferz dike: ev pêgirîyên han girêdayî danûstandin û parastina tevaya kesên li cem wan girtî ne, ji ber ku gerek e bi awayekî mirovî bi wan re bidin û bistînin, di nav de parastina wan ji her cureyekî êşkence û mûameleya xerab[93], û gerek e guhdana tenduristî û xwarina guncaw û têrker ji wan re bê pêşkêşkirin.[94]

Lê, li girtîgehên rêxistina DAIŞ`ê, gelek sûcên der-mirovî hatin kirin, weke kuştin, êşkencekirin, astengkirina azadîyê, wendakirina bi zorê, koletî, şêwandin weke awayeke ji awayên cezayên bedenî[95], binçavkirina heta demeke dirêj di rewşine ne mirovane[96] û danûstandineke hişk[97] de, û

[88] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق. وينطبق على هذه الأفعال وصف جريمة حرب أيضا.

[89] Li rûpela 15`an vegere.

[90] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، (A/HRC/46/55) ، 11 اذار 2021

[91] ياسر الحويش، مهند نوح،" حقوق الانسان"، مرجع سابق.

[92] نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، دار رسلان، دمشق، 2015، ومايا الدباس، جاسم ذكريا، القانون الدولي الإنساني"، منشورات الجامعة الافتراضية السورية، 2018.

[93] طارق برنجكي،"استراتيجية مناهضة جريمة التعذيب في القانون الدولي والقضاء الوطني"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية السورية، 2021.

[94] تقرير الأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية" 27 كانون الثاني 2016.

[95] الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق. وشكلت هذه الانتهاكات وغيرها جريمة إبادة ضد الأقلية الايزيدية، انظر سابقاً ص 15.

[96] كانوا يُحتجزون في زنزانات مكتظة مليئة بالحشرات، بحسب تقرير لمجلس حقوق الانسان، راجع تقرير مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

[97] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، مجلس حقوق الإنسان- هيئة الأمم المتحدة، "الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، 08 مارس 2018.

îdamkirina meydanî[98]. Li wan girtîgehan, girtîyan xwarina pêwîst û guncaw bi dest nedixistin, û rê nedidan wan ku bi kesekî ji derveyî girtîgehê re biaxivin yan têkilîyê deynin.[99]

Rojnamevan û çalakên di biwarê mafên mirovan de dixebitin ji kesên herî zêde ku ji alîyê DAIŞ`ê ve dihatin binçavkirin û girtin, ew jî bi armanca kontrolkirina herikîna agahîyan li deverên di bin kontrola DAIŞê de[100].

Her wiha sivîlên ku bi binpêkirina rêzikname û biryarnameyê DAIŞê hatine tometbarkirin, û li alîyekî din ew kesên ku bi danûstandina bi hêzên çekdar ên din re hatine tawanbarkirin, bi awayekî rojane rastî bêparhiştina neqanûnî ji azadîyê, êşkence û muameleya xerab dihatin[101]. Li gorî raporeke Neteweyên Yekbûyî, rêxistina "Dewleta Îslamî" li parêzgehên Reqa û Dêra Zorê sivîl bi binpêkirina rêgezên "El-cema`a" an jî bi hevkarîya bi "hêzên dijmin" an bi dîlgirtîyên [102] ji hêzên din ên çekdar hatibûn tawanbarkirin binçav dikirin. Her wiha hin çalak û rojnamevên[103] ku di biwarê ragihandina xwecihî de kar dikirin an jî bi rojanamevanên navdewletî re dixebitîn[104] bi gilîkirina li ser binpêkirinên DAIŞ`ê hatin tawanbarkirin û bi haman çarenûsê re rû bi rû bûn.

Di encama wan binpêkirinan de, çi rojnamevan û çalakîyên di biwarê bibelgekirina binpêkirinên ku civakên xwecihî yên li jêr kontrola DAIŞ`ê de êşa wan dikêşan, ji parastina taybet a ku qanûna navdewletî ji wan re dabîn dike, bêpar man û bi wendakirin, binçavkirin, êşkence û kuştinê[105] re rû bi rû man, ev sûcên ku digihêjin asta sûcên der-mirovî.

**Pênc- Êşkencekirin:** Rêxistina DAIŞ`ê li herêmên di bin destê xwe de, sîyaset û rêbazeke birêxistinkirî ya belavkirina tirs û xofê di nava dilê xelkê de meşand, ew jî bi armanca tewnadina serê xelkê li ber

---

[98] Pirrê caran girtî dihatin îdamkirin piştî hukimê ji alîyê dadgehên ne pispor û birêkûpêk ve li wan dihat birîn. Li raporta NY vegere:
"بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية" 27 كانون الثاني 2016.

[99] تقرير مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13

[100] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق

[101] تقرير الأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

[102] تقرير الأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

[103] تقرير بعنوان: الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية، لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية مجلس حقوق الإنسان- هيئة الأمم المتحدة، 8 مارس 2018، وأيضا تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، رقم: HRC/A23/58/، مجلس حقوق الإنسان هيئة الأمم المتحدة، 23 مارس 2018.

[104] الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[105] Heman çavkanî.

desthilatdarî û hukimê xwe. Di vê derbarê de, li gelek herêman evê rêxistinê kiryar û kirinên hovane yên ku digihêjin asta bbirina êrîşekê li ser xelkên sivîl encam dan, nemaze li Reqa, Dêra Zorê, Hesekê û herêmên bakur-rojhilat ên parêzgeha Helebê.[106]

Di çarçoveya êrîşên xwe yên sîstematîk û berfireh li dijî xelkên sivîl, rêxistina DAIŞ`ê gelek kirinên bidarvekirin, qamçîkirin, serjêkirin û daleqandina wan li qadên giştî[107] pêk anîn. Evê yekê hişt ku gelek êş û azarên bedenî û derûnî yên mezin li cem xelkên sivîl li herêmên li jêr kontrola DAIŞ`ê çêbibin. Li nik wê, gelek sûcên der-mirovî yên weke êşkencekirin, danûstandina hişk û ne-mirovane, ku xelkên sivîl pîs dikirin jî pêk anîn.

Her wiha rêxistina DAIŞ`ê li navendên binçavkirinê[108] şêweyên cuda û rêbazên hovane yên êşkenceyê bi kar dianîn; di vê derbarê de girtî rastî lêdana bi daran an kabloyan, qamçîyan, û şokê elektrîkê dihatin, û bi dîwar û banan ve ji lingên xwe di rewşeke stresê[109] de dihatin daliqandin. Li kêleka wê, bi gefa binçavkirin, serjêkirin û xinqandina bi gazê û kuştina bi keviran re[110] rû bi rû bûn. Di vê derbarê de, di dawîya sala 2020an de, li parêzgeha Reqayê, li nêzî girtîgeheke bi ser DAIŞ`ê ve, çar gorên komî hatin dîtin.[111]

**Şeş - Tecawiz an tundîya seksî:** Xala yekem ji madeya heftan a yasaya Dadgeha Tawanan a Navdewletî behsa tawana tecawizê (destavêtin) dike, û dibîne ku her kiryarek ku li ser bingeha destavêtin, koletîya seksî, fuhûşa bi darê zorê, ducanîbûna bi darê zorê, bêdûndîya bi darê zorê û yan jî her awayekî tundîya sêksî  ya bi vî rengî ji xeterîyê li gorî bendên vê destûrê sûcên der-mirovî ne.[112]

Di destpêka tebaxa 2014`an de, dema ku DAIŞ`ê êrîşî Şengalê, li bakurê Îraqê, kir, bi sedan jin û keçên îzdî revandin û ew ber bi Sûrîyayê ve birin, îcarê li wê derê weke "xenayîm El-herb" li bazarên bi navê "Kole û bazara Sebaya", li Reqa, Heleb, Himis, Hesekê, û Dêra Zorê yên Sûrîyayê

---

[106] حول جريمة التعذيب، راجع: طارق برنجكي،" استراتيجية مناهضة جريمة التعذيب في القانون الدولي والقضاء الوطني"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية السورية، 2021.

[107] تقرير مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

[108] الشبكة السورية لحقوق الانسان، "التعذيب ومراكز الاحتجاز لدى تنظيم الدولة: القاع الأسود"، 22 نيسان 2016، www.sn-hr.org

[109] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا A/HRC/46/55 11 آذار 2021.

[110] الشبكة السورية لحقوق الانسان، "التعذيب ومراكز الاحتجاز لدى تنظيم الدولة: القاع الأسود"، مرجع سابق.

[111] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، (A/HRC/46/55 ) ، مرجع سابق.

[112] النظام الأساسي لمحكمة الجنايات الدولية.

hatin firotin, hin ji wan keçan temenê wan ne zêdeyî 9 salan bû. DAIŞ`ê ev jin û keçên han hem difirotin zilamên li Reqayê dijîn, û hin ji wan li cihên bi navê "Rawestgehên DAIŞ`ê" li deverên şaristanî li heman parêzgehê zindan dikirin. Ev jinên girtî weke dîlgirtîyan li cem DAIŞ`ê, û ji ber ku bi çavê "Mulik El-yemîn" li wan dinêrîn, rastî tecawiz, tundî û koletîya sêksî yên sîstematîk dihatin, çi ji hêla çekdarên DAIŞ`ê yên ku ji anîyên şer vedigerîyan bixwe ve, çi jî ji alîyê zilamên ku ew dianîn bazara vekirî.[113]

Desteserkirina neqanûnî ya jinên êzîdî, bi mebesteke eşkere ya ji bo girtin û kolekirina wan, nîyeta DAIŞ’ê ya ji bo ducanîkirina bi zorê di nav jin û keçan de piştrast dike, û bi vî awayî bandorê li avahîya etnîkî û olî ya kêmara êzîdî dike[114]. Dema ku ev kiryar di çarçoveya êrîşeke berfireh û sîstematîk de pêk tên, dibin sûcên der-mirovî yên weke koletî, destavêtin û tundîya sêksî.[115]

**Heft- wendakirina bi zorê:** Ev tê wateya binçavkirin an jî desteserkirina kesekî/ê yan jî revandina wê/wî ji alîyê dewletekê ve yan rêxistineke sîyasî yan jî bi erêkirina wan an bi piştigrîya wan û bêdengîya di derbarê wê de. Paşê, redkirina naskirina mafê wan kesên desteserkirî di azadî yan jî dayîna agahîyan li ser cihê lê dimînin û di encamê de bêparhiştina wan ji parastina qanûnî heta demeke domdirêj.[116]

Li gorî qanûna mirovî ya navdewletî ya adetî, wendakirina bi zorê qedexe ye[117].Her wiha li gorî xala 98`an a "Komîteya Navdewletî ya Xaça Sor, Qanûna Mirovî ya Navdewletî", wendakirina bi zorê di pevçûnên çekdarî yên navdewletî û ne-navdewletî de qedexe ye, û xala 117 jî destnîşan dike ku her alîyekî pevçûnê dê tedbîrên liberdest bigire da ku agahdarîyê li ser kesên ku di encama şerekî çekdarî de winda bûne bide, û her agahîyeke girêdayî çarenivîsa wan hebe dide endamên malbatên wan. Li alîyê din

113 الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

114 غسان شحاذي منذر، "الحماية الجزائية للنساء من العنف الجنسي في القانون الدولي الإنساني-دراسة تطبيقية على الجرائم المرتكبة من قبل التنظيمات الإرهابية المسلحة في سورية"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية، 2021.

115 تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

116 Madeya 7`an ji Pergala Romayê ya Bingehîn.

117 مايا الدباس، جاسم ذكريا، القانون الدولي الإنساني"، منشورات الجامعة الافتراضية السورية، 2018.

qanûnên mirovî yên navdewletî birina dîlgirityan qedexe dike[118] û weke sûcê şer dibîne.[119]

Her wisa li gorî yasaya Dadgeha Tawanan a Navdewletî, pêkanîna sîstematîk a windakirina bi darê zorê, tawaneke der-mirovî ye[120], û ev yek ji bo tiştên ku DAIŞê di warê zêdebûna berfireh û sîstematîk a windayan de kirîye, derbas dibe. Heta niha, çarenivîsa bi hezaran kesên bi darê zorê hatine windakirin ne dîyar e, li gorî Tora Sûrî ya Mafên Mirov: herî kêm 18,684 kes, di nav wan de 319 zarok û 255 jin, hîna li cem rêxistina DAIŞ`ê, ji dema damezirandina wê heta çileyê 2022`an ne dîyar e.[121]

### Mijara Sêyem: Binpêkirinên DAIŞ`ê weke sûcên şer

Gelek caran sûcên şer û sûcên der-mirovî mîna hevûdin tên, lê cudahîya wan ew e ku sûcên der-mirovî dibe ku hem di dema şer û hem jî di ya aştîyê de çêbibin, lê sûcên şer tenê di dema şerekî çekdarî de, eger navdewletî be yan na, çêdibe.[122]

Ji bo fêmkirin û zelalkirina sûcên şer û veqetandina wan ji sûcên der-mirovî, em ê hewl bidin destpêkê evan sûcên navdewletî pênase bikin, paşê binpêkirinên herî mezin yên DAIŞ`ê bidin ber van pênaseyan, ev binpêkirinên ku li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê hatine kirin û weke sûcên şer tên dîtin.

#### 1. Danasîna Sûcên Şer

Sûcên şer: binpêkirinên xeternak ên li dijî qanûna mirovî ya navdewletî[123] ne û berpirsyartîya tawanî ya ferdî[124] bi xwe re tînin. Xala 6`an a pergrafa (B) ji "Lîsteya Nurnbergê" wiha wan pênase dike: "Ew kirinên ku edet û qanûnên şer binpê dikin in"[125]. Her wiha li gorî her çar rêkeftinên Cinêvê

---

[118] Madeya 34`an ji Rêkeftina Cinêvê ya 4. Ya sala 1949`an, û madeya 3`an a di navbera Rêkeftinên Cinêvê de hevbeş e, û madeya 75`an (G2) ji protokola zêdek ya yekem ji sala 1977`an, û madeya 4`an (G2) ji protokola zêdek ya duyem ji sala 1977`an.
[119] Paşê li rûpela 33`an binêre.
[120] Madeya 1-7, T ji Pergala Romayê ya Bingehîn.
[121] الشبكة السورية لحقوق الانسان "أبرز انتهاكات تنظيم داعش بحق المجتمع السوري وإسهامه في تشويه الحراك الشعبي المطالب بالحرية والكرامة"، شباط 2022، ص 10، www.sn-hr.org
[122] نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، مرجع سابق.
[123] مايا الدباس، جاسم ذكريا، القانون الدولي الإنساني"، مرجع سابق.
[124] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "فقدت كرامتي: العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية)، A/HRC/37/CRP 3 ، 8 آذار 2018.
[125] Her wiha herdu pergalên bingehîn ên Dadgeha Tawanên Navdewletî ya Yoguslavîyayê û Dadgeha Tawanên Navdewletî ya Rawendayê jî biryar derbarê vî cureyê sûcan de da.
نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، دار رسلان، دمشق، 2015.

yên sala 1949`an wiha tên pênasekirin: "Kirin û binpêkirinên pirr mezin in". Binpêkirinên pirr Mezin: Hemû kirin û kiryarên ku di asta xeterîya xwe de digihêjin asta sûcên şer ên ku divê sûcdarê wan bê cezakirin in. Hûrgulîyên van binpêkirinên pirr mezin û danasîna wan di xalên 5 û 50`î yên rêkeftina yekemîn[126] de, her wiha di xalên 44 û 51`ê ji rêkeftina duyemîn[127] ji her çar rêkeftinên Cinêvê de hatine şîrovekirin.

Her wiha pergala Romayê ya bingehîn a Dadgeha Tawanên Navdewletî jî sûcên şer di nava sûcên navdewletî de, di xala xwe ya 5`an[128] de destnîşan dike. Di xala 8`an a heman pergalê de, kiryarên ku bi rêya wan ew tawan pêk tên hatine rêzkirin. Îcarê xala navborî peywira dadgehê di derbarê sûcên şer de destnîşan dike, "nemaze dema ku di çarçoveya pilanekê, yan sîyasteke giştî, yan jî di çarçoveya proseseke berfireh a van tawanan de encam bidin". Ji gotina "Nemaze" dîyar dibe ku peywira dadgehê di çarçoveya tawanên herî xeternak ên der heqê civaka navdewletî de dimîne, îcarê di encamê de dibe tengezarîyek ji alîyê hisabxwestina tawanî ya navdewletî ji sûcdarên şer li pêşberî dadgehê[129], û dihêle ku peywira evê dadgeha dawîn di derbarê sûcdarên evan sûcan de girêdayî destnîşanîya di pergalê de sepandî be.[130]

Madeya 8`an ji pergala Romayê ya bingehîn –bi hûrgilî- bêhtirî 50`î bendên ku sûcên şer ên dikevin nava peywir û pisporîya dadgehê de di nava xwe dihwîne. Ew bixwe çar kom in; du ji wan girêdayî binpêkirin û sûcên di pevçûnên çekdarî yên navdewletî[131] de çêbûne ne, û du komên

---

[126] Rêkeftina Cinêvê ya taybet bi başkirina rewşa nexweş û birîndarên hêzên çekdar li meydanê, dîrok 12/8/1949, ev bixwe jî sererastkirineke Rêkeftina Cinêvê ya yekem , ya sala 1929`an e.
[127] Rêkeftina Cinêvê ya duyem a taybet bi başkirina rewşa nexweş û birîndarên hêzên çekdar li derîyayê, dîrok 12/8/1949`an.
[128] محمد غانم إبراهيم، "دور القانون الدولي الجنائي في تجريم انتهاكات القانون الدولي الإنساني-دراسة تطبيقية تحليلية على النظام الأساسي للمحكمة الجنائية الدولية"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية السورية، 2021.
[129] علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، منشورات الحلبي الحقوقية، بيروت،2015.

[130] Tê zanîn ku berpirsîyarîya tawanan ji bo pêkanîna sûcên şer ne hewce ye ku ev tawan di astek mezin û berfireh de were kirin, wek ku di tawanên der-mirovî û jenosîdê de ye, lê belê bes e ku kujer li gorî hukmên hiqûqa mirovî ya navneteweyî were dîtin. Lêveger:
علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق.

[131] Madeya 8`an ji Pergala Romayê ya bingehîn dibêje: "Dema ku girêdayî sûcên şer bin, nemaze dema di çarçoveya planekê yan jî sîyasteke giştî yan jî di çarçoveya operasyoneke berfireh a van sûcan de bin ew dê ji komîsyonên dadgehê bin. Îcarê bi armanca evê Pergala bingehîn, Sûcên şer tên wateya:
a) Binpêkirinên cidî yên Peymana Cenevreyê yên 12 Tebaxa 1949`an Yek ji van kiryarên jêrîn li dijî kes an milkên ku bi bendên têkildar ên Peymana Cenevreyê hatine parastin:
1- kuştinê bi zanebûn. 2- êşkence an jî muameleya nemirovane, di nav de pêkanîna ceribandinên bîyolojîkî. 3- Zerarkirina bizanebûn a xeternak li laş û tenduristîyê. 4-Bêyî ku pêwîstîyeke leşkerî hebe,

din jî girêdayî sûcên pevçûnên çekdarî yên ne-navdewletî[132] ne. hêjayî gotinê ye ku bipêşveçûna herî girîng ji hêla sûcên şer ve, girêdayî destnîşankirina pergala Romayê ji peywira dadgehê di derbarê sûcên ku di pevçûnên çekdarî yên ne-navdewletî [133]de encam dane ye. Ev pergala

---

talan û wêrankirina malûmilkan û desteserkirina wan bi awayekî bêserûber û der-qanûnî. 5- Mecbûrkirina her girtîyekî şer an jî kesekî din yê parastî ku di nav refên dewleta dijmin de xizmetê bike. Bêparhiştina bi zanebûn a her êsîrekê yan jî kesekî parastî ji mafê xwe yê dadgehkirineke dadwer û bi rêk û pêk. 7- Sirgûnkirin, veguheztin an jî girtina neqanûnî 8- Rehînegirtin.
b) Binpêkirinên din ên cidî yên qanûn û adetên ku ji bo pevçûnên çekdarî yên navneteweyî di çarçoveya qanûnên navneteweyî de têne sepandin, yek ji van kirinên jêrîn:
1- Bi qestî arastekirina êrîşan li dijî gelê sivîl, an jî li dijî kesên sivîl ên ku rasterast beşdarî şer nebin. malzemeyên an Yekîneyên an wesayîtên ku di arîkarîya mirovahî an mîsyonên aştîparêzîyê de li gorî Peymana Neteweyên Yekbûyî têne bikar anîn, heya ku mafê wan ê parastina ku ji sivîlan re an jî tiştên sivîl li gorî qanûna şerê çekdarî tê dayîn dizanin ku êrîşek bi vî rengî dê bibe sedema windakirina can an zirarê di nav sivîlan de an jî zirara sivîl an jî zirarek berfireh, demdirêj û giran li jîngeha xwezayî ku dê li gorî destkeftîyên leşkerî yên rasterast ên berbiçav zêde be. 5- Bi ti awayî êrîş kirin an jî bombekirina bajaran, gundan, xanîyan an jî avahîyên bêparastin ku ne armancên leşkerî ne. . 7- Bi xeletî bikaranîna ala agirbestê, ala dijmin, nîşan û kincên wê yên leşkerî, an jî ala Neteweyên Yekbûyî, nîşan û cilên wê yên leşkerî. Her wiha diruşmên taybet ên Peymana Cinêvê, ku di encamê de mirina kesan an jî birîndarbûna wan giran e. tevahîya nifûsa xaka dagirkirî an jî parçeyên wan di nava vê xakê de. 9- Bi qestî êrîşan li dijî avahîyên ku ji bo armancên olî, perwerdeyî, hunerî, zanistî û xêrxwazî hatine destnîşankirin, bermahîyên dîrokî, nexweşxane û cihên ku nexweş û birîndar lê tên komkirin, bi şertê ku ew nebin hedefên leşkerî alîyekî dijminê sinetkirina laşî yan jî her cure tedawîyeke bijîjkî yan zanistî ya ku ji alîyê tedawîya bijîjkî, diranan, yan nexweşxanê ya kesê eleqedar ve nayê rewakirin û ku ne di berjewendîya wî/wê de ye û dibe sedema mirina wî kesî. 11- Kuştin an bi xayintî birîndarkirina kesên ku mensûbê dewletek an artêşê ne. Ji alîyê pêwîstîyên şer ve 14- Daxuyanîya ku maf û daxwazên hemwelatîyên partîya neyar betal dibin, di her dadgehê de nayên pejirandin welat, herçiqas berîya derketina şer di xizmeta dewleta şerker de bûna 16- Talankirina bajarek û cihekê, her çend bi darê zorê hatibe girtin. 17- Bikaranîna jehrîn an jî çekên jehrî 18- Bikaranîna gazên xeniqandinê, jehrî û hemû şilek, maddeyên an jî cîhazên mîna wan 19- Bikaranîna fîşekên ku bi hêsanî di laşê mirov de belav dibin an jî dipelçiqînin qalibên qayîm ên ku tevaya laşê fîşekan an jî fîşekan bi qalikê vala nagirin 20 - Bikaranîna çek, fuze, malzemeyên an jî rêbazên şer ên ku ji hêla cewherê xwe ve dibin sedema zirarên zêde an jî êşên nehewce an jî di xwezaya xwe de bêserûber in. , bi binpêkirina hiqûqa navneteweyî ya şerê çekdarî, bi şertê ku ev çek, mûşek, malzemeyên an jî rêbazên şer ên Berfereh bêne qedexekirin û di pêvekek vê qanûnê de cih bigirin, bi guherînek li gorî bendên têkildar ên di nav de hene. Xalên 121 û 123. 21- Destdirêjî li ser rûmeta mirov, bi taybetî jî heqaret û heqaret. 22- Tecawiz, koletîya zayendî, fuhûşa bi darê zorê, ducanîya bi darê zorê ya ku di xala 7. xala 2. de hatîye dîyarkirin, sterilkirina bi darê zorê yan jî her cure şîdeta zayendî jî binpêkirineke cidî ya Peymana Cenevreyê ye. 23- Îstîsmarkirina hebûna sivîl an jî kesên din ên parastî ji bo girtina parêzbendîyê ji operasyonên leşkerî bo xal, dever û hêzên taybet ên leşkerî. 24- Bi mebesta êrîşan li dijî avahî, malzeme, yekîneyên bijîşkî, rêyên veguhestinê û kesên ku amblemên cihê yên ku di peymanên Cenevreyê de hatine destnîşan kirin li gorî yasayên navneteweyî bi kar tînin. 25- Bi qestî birçîkirina sivîlan weke rêbazeke şer bi rêya bêparkirina wan ji malzemeyên ku ji bo jîyana wan pêwîst in, tevî astengkirina bi qestî pêdivîyên alîkarîyê yên ku di peymanên Cinêvê de hatine dîyarkirin. 26- Leşkerkirina mecbûrî yan bi dilxwazî ya zarokên jêrî panzdeh salî bo hêzên çekdar ên niştimanî yan jî bikaranîna wan ji bo beşdarbûna çalak di şer de.

[132] علي وهبي ديب، "المحاكم الجنائية الدولية: تطورها ودورها في قمع الجرائم الدولية"، مرجع سابق.

[133] Lê li gorî Pergala Romayê ya bingehîn, rageşîyên navxwe her wekî kirirnên tevlîhevderxistinê û yên tundrew û tekane yan jî yên mîna wan cihê xwe di nav pevçûnên ne-navdewletî de nagirine, li gorî madeya 8`an a Pergala Romayê ya bingehîn: 13- Pargrafa (2) (H li ser pevçûnên çekdarî yên ne-navdewletî tê cîbicîkirin, lewra li rewşên tevlihevîyê û rageşîyên navxwe nayê cîbicîkirin, lê li ser pevçûnên çekdarî yên ku li herêmeke dewletê encam bide, ew jî dema ku ev pevçûna çekdarî

han li ser peywira dadgehê ya venêrîna binpêkirinên mezin ên madeya 3`an a di navbera her çar rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an de hevbeş e tekez dike, lê eger pevçûneke çekdarî ne-navdewletî encam da.[134]

Li gorî tişta me li jorê gotî, binpêkirinên mezin ên madeya 3`an a di navbera her çar rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an de hevbeş, ji alîyê yekem ve wek sûcên şer ên di rewşa pevçûna çekdarî yê ne-navdewletî[135] de tên hesibandin, ew jî her kirinên li dijî kesên ku beşdarî ti xebatên şerî nebûne, di nav de endamên çekdar ên ku dest ji çekê xwe berdane yan jî ew kesên ku nekarîn şer bikin ji ber nexweşî, birîndarbûn, desteserî yan jî sedemeke din: (1-Bikaranîna tundîyê li dijî jîyan û kesan, nemaze kuştina bi her awayî û rêşepêşkirin, danûstandina hişk û êşkencekirin. 2-Destdirêjîya li namûsa kesekî, bi taybet heqaret û rezîlkirin. 3-birina rehîneyan. 4-Derxistina cezayan û bicihanîna îdaman bêyî hebûna hikmekî ji alîyê dadgeheke fermî û birêkûpêk, ku karîbe tevaya mîsogerîyên dadwerî yên fermî û pêwîst bigire ser xwe).

Ji alîyekî din ve, têgiha Sûcên Şer digehe asta binpêkirinên mezin ên din, ên qanûn û adetên pevçûnên çekdarî yên ne-navdewletî, di çarçoveya destnîşankirî ya qanûna navdewlertî, ku ew jî evan kirinên han di nava xwe dihewîne:

**1-** Êrîşbirina bi zanebûn li ser xelkên sivîl an li dijî kesên sivîl, ji ber ku sivîl in û bi awayekî rasterast beşdarî şer nebûne.
**2-** Êrîşbirina bi zanebûn li ser avahî, kelûpel, navendên bijîşkî, navgînên çûn û hatinê û kesên ku dirûşmeyeke xwe ya taybet a li gorî rêkeftinên Cinêvê û qanûna navdewletî hene.
**3-** Êrîşbirina bi zanebûn li ser karmend, an sazgeh, an kelûpel, an navend, an jî wesayîtên ku bi karekî mirovî radibin, an aştîyê diparêzin li gorî hevpeymana Neteweyên yekbûyî, çimkî parastina sivîl û deverên sivîl li gorî qanûna navdewletî ya pevçûnên çekdarî girtine ser milê xwe.

---

domdirêj bike û di navbera desthilatên hikûmetê û komikên çekdar ên birêxistinkirî de be, yan jî di navbera wan komikan xwebixwe de be.

[134] Xala heştem a yasaya Romayê di dawîyê de tekez dike ku ev dadwerî bandorê li berpirsîyarîya hukûmetê nake ji bo parastin an damezrandina qanûn û nîzamê di nav dewletê de an jî parastina yekitîya dewletê û yekparçeyîya axa dewletê bi hemî rêyên rewa. Xala heştem a Qanûna Romayê: (3-Tiştek di paragrafên 2 (c) û (e) de bandorê li berpirsîyarîya hukûmetê nake ji bo parastin an sazkirina qanûn û nîzama dewletê an parastina yekîtî û yekparçebûna axa dewletê, bi hemû navgînên rewa).

[135] Li gorî naveroka madeya 8`an ji pargrafa C a Pergala Romayê ya bingehîn.

**4-** Êrîşbirina bi zanebûn li ser avahîyên xwedî taybetmendîyeke olî, yan hînkarî, yan hunerî, yan zanistî, yan xêrî, her wekî wan jî, şûnwarên dîrokî, nexweşxane, deverên kombûna nexweş û birîndaran, lê bi mercê ku ev deverên han dûrî armancên leşkerî bin.

**5-** Talankirina çi bajarokekî yan jî devereke din, tevî ku bi zorê hatibe destserkirin.

**6-** Destdirêjî yan koletîya sêksî, û fihûş û ducanîya bi darê zorê, wekî çawa di xala (2- f) ji madeya heftan de hatîye dîyarkirin an jî pakkirina bi zorê, yan jî her awayeke ji awayên tundîya sêksî ku li şûna binpêkirineke xeternak a madeya 3`an a di navbera her çar rêkeftinên Cinêvê de hevbeş.

**7-** Tecnîdkirin û leşkerkirina zarokên kêmî 15 salî, bi zorê yan jî bi awayekî xwebexş, di nava hêzên çekdar an komên çekdar an jî bikaranîna wan di nava karên şerî de.

**8-** Ji derveyî sedemên biewlekirina sivîlan an sedemên leşkerî yên pêwîst, fermandana derbederkirina xelkên sivîl ji ber sedemên girêdayî şer.

**9-** Kuştin an jî birîndarkirina şervanekî ji yê dijmin bi awayekî xedirkar.

**10-** Ragihandina fermana ku divê her kes jîyana xwe ji dest bide.

**11-** Rasthatina kesên li jêr desthilata alîyekî din ê pevçûnê ji reşpêşkirina laşî yan her cureyek ji cureyên taqîyên bijîşkî yan zanistî ku ti bihaneya xwe ya dermankirina bijîşkî yan dermankirina diranan yan jî dermankirina li nexweşxaneyê tune ye û ne di berjewndîyên wî kesî de ye, û her wiha di sedema wefata wî/wan kesan, an jî tenduristîya wan dikeve xeterîyê.

**12-** Wêrankirin, hilweşandin û desteserkirina malûmilkên dijmin tevî ku pêdivîya şer pê tuneye.[136]

Bê guman, destnîşankirina peywira dadgehê ji bo cezakirina tawanbarên tawanên şerî yên ku di dema pevçûnên çekdarî yên ne-navdewletî de hatine kirin, ji bo tepeserkirina vê cureyê tawanan, sizakirina tawanbarên wê û parastina qurbanîyên vê cureyê şerê çekdarî, gaveke mezin û pêşketî ye. Li gorî vê yekê, binpêkirinên mezin û metirsîdar ên DAIŞê di dema "xîlafeta" xwe de li herêmên bakur û rojhilatê Sûrîyê pêk anîne, ku

[136] Madeya 8`an ji Pergala Romayê ya bingehîn.

digihêjin asta tawanên şer, dikevin çarçoveya peywira desthilata Dadgeha Tawanan a Navdewletî.[137]

## 2. Pratîka sûcên şer ên ku ji hêla DAIŞ`ê ve hatine kirin

Madeya 3`an a di navbera rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an[138] de hevbeş e, û hin madeyên qanûna navdewletî ya edetî ku di pevçûnên çekdarî de tên cîbicîkirin, kuştin, êşkence û îdamkirina ne-qanûnî wek sûc dibînin. Ev pêgirîyên han ji bo tevaya komên çekdar ên beşdarî şer dibin û ne girêdayî dewlet û sazîyên wê ne derbasdar e. girêdayî mijarê, ji her komikên çekdar ên ne girêdayî dewletê, û ji welatîyên hikûmetên bîyanî yên ku beşdarî kirinên dijminahîyê dibin tê xwestin ku li gorî pêgirîyên parastina mafên mirov ên kesên Ii herêmên jêr birêveberîya wan dijîn[139] tev bigerin. Îcarê, di vê derbarê de ji DAIŞ`ê tê xwestin ku pabendî evan rêgez û danûstandina mirovane bibe, ji ber ku di dawîyê de ew jî komeke çekdar a birêxistinkirî ye û berî niha desthilatdarîya wê li ser erdê hebû.[140]

Tevî wê jî, û li gorî pênaseya sûcên şer di rewşa pevçûna çekdarî ya ne-navdewletî de, her wiha li gorî gelek raportên navdewletî yên girêdayî kirinên alîyên şer li Sûrîyayê, pirranîya kirinên evan alîyan dighêjin asta binpêkirinên mezin ên rêgezên qanûna navdewletî yên girêdayî mijarê.[141]

Rêxistina DAIŞ`ê ya terorîst, gelek binpêkirinên mezin ên qanûn û erfê şer li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê kirine, em dikarin wiha wan komîserhev bikin:

**Yek- Kuştina bizanebûn**: heta ku em li pêşberî kuştineke bizanebûn bin, divê herî kêm kesê sûcdar kesekî/ê yan zêdetirî yekî/ê bikuje, ku ev kesên han li gorî rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an parastî bin (yan kesekî/e nikare şer bike, yan sivîl be yan jî beşdarî şer nebûye), her wiha divê du hêmanên sereke li cem ê sûcdar peyda bin; ew jî vîn[142] û zanîn in[143].

---

137 Paşê binêre.

138 Sûrîya ji welatên ku li ser van rêkeftinan îmze kirîye ye.

139 تقرير الأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، 27 كانون الثاني 2016.

140 الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق

141 Nemaze madeya 8`an a Pergala Romayê ya bingehîn.

142 Sûcdar ji rewşên rastîn ên ku îspat dikin ku ev kesên mexdûr di bin parastina peymanên Cenevreyê yên sala 1949an de ne, haydar in û ku şer pevçûnek çekdarî ya ne navneteweyî ye. Li ser hêmanên sûc bi giştî, binêre:

Endamên DAIŞ`ê di operasyonên xwe yên kuştinê de, yên li herêmên di bin destê xwe de, gelek rêbaz li dijî jin, keç û mêran bi kar anîn, ew jî bi hinceta binpêkirina bîr û bawerîyên ola îslamî yên li gorî şîroveya evê rêxistina terorîst. Ji wan rêbazên ku DAIŞ`ê bi kar tanîn jî şewtandin e. Di sala 2015`an de, çekdarên DAIŞ`ê pîlotê urdinî (Mûaz Kesasîbeh) bi saxî di qefeseke hesinî de şewitand û vîdyoya şewtandina wî li ser torên înternetê belav kir.[144]

Lê rêbaza hovane ya ku herî zêde dihat bikaranîn, serjêkirin bû, ev hukimê han bi awayekî zêde û domdar ji dema ku DAIŞ`ê dest danî ser herêmên cuda li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê dihat cîbicîkirin. Piştî ku serî jê dikirin, li qad û baxçeyên giştî didaleqandin, her wekî çawa li çerxerêya El Naîm, li bajarê Reqayê (bi Çerxerêya Cehîm jî tê nasîn) çêdibû, ku li vê çerxerêya han gelek bidarvekirinên eşkere, serjêkirin û daleqandina serîyan encam dane.[145]

Di dema di navberî 15`ê îlonê û 5`ê mijdara 2014`an[146] de, rêxistina DAIŞ`ê şervanên kurd ên ku di êrîşa li ser bajarê Kobanîyê de (parêzgeha Helebê) hatibûn dîlgirtin, bi dar ve kirin. Her wiha, di nîva îlona 2014`an, li bajarê Girê Spî (Reqa) DAIŞ`ê jineke kurd a şervan li ber çavên komek sivîlên girtî yên ji bajarê Kobanîyê serjê kir, û berîya serê wê jê bikin, çekdarekî DAIŞ`ê li pêşîya cemawer got: "Evê jinê bi qasî 3 mehan li gel "kafiran" şerê me dikir, lewra niha ez ê serê wê li pêşîya we jê bikin, da ku hûn jî ji zarok û cîranên xwe re bêjin ku dawî û çarenûsa "kafiran" her ev e."[147]

Li alîyekî din, rêxistina DAIŞ`ê gelek komkujî der heqê leşkerên hikûmeta sûrî yên ku dîl hatin girtin[148] de jî pêk anîn, di vê derbarê de, li bajarê Tebqayê (Parêzgeha Reqayê) 200 leşkerên hikûmetê ji alîyê DAIŞ`ê ve dîl hatin girtin, ew jî piştî ku rêxistinê êrîşî baregeha esmanî ya derveyî bajêr, di tebaxa 2014`an de, kir û çekdarên rêxistinê ew leşker

---

مرجع سابق، وعماد عبيد،" قانون العقوبات الخاص-الجرائم الواقعة على الأشخاص- الجرائم الواقعة على الأموال"، منشورات الجامعة الافتراضية السورية، 2018.

143 نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، مرجع سابق.

144 فلاح عبد الحسن عبد أيوب، "التكييف القانوني لجرائم داعش في ضوء القانون الجنائي الدولي"، مجلة الكلية الإسلامية الجامعة، العدد 61 .

145 إيلونور لوبرا، "جرائم داعش"، https://espritsurcouf.fr/securite-crimes-daech-eleonore-le-bars/، مقال باللغة الفرنسية.

146 Li berê veger.

147 الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

148 مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

bi tena bincilên wan hiştin û berê wan da çolistanê û ew li wir dan ber guleyan[149]. Her di heman salê de, di 25`ê temûzê[150] de dema ku baregeha Firqeya 17`an li bajarê Reqayê ket, DAIŞ`ê hemû leşkerên hikûmeta sûrî yên dîl hatin girtin kuştin û piştî kuştinê serê termê wan jê kirin.

Li vir, dema ku çekdarên DAIŞ`ê piştî êrîşeke leşkerî komkujîyan derheqê şervan û sivîlên dîlgirtî de pêk bîne, ev tê wateya ku ev rêxistin binpêkirinên hovane yên qanûna mirovî ya navdewletî pêk tîne, û sûcên şer ên di çarçoveya kuştina bizanebûn de dikin.[151]

**Du- Êşkence, reşepêşkirina laşî û ji bilî wan ji nêzîkatîyên hişk:** Ev tê wateya ku sûcdar bi zanebûn û tevî ku rewşên heyî dizane êşeke bedenî yan derûnî yan jî azareke mezin ji kesekî/ê re yan komek kes re çêbike, ev kesên ku li gorî rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an[152] parastî ne, ev kirinên han jî bi armanca bidestxistina agahî yan mukirhatinekê bi rêya tirsandin an bi darê zorê yan jî ji ber her sedemeke nijadperestî tên kirin.[153]

Xelkê navçeyên di bin kontrola DAIŞê de tûşî kiryarên tundûtûjîyê yên hovane bûne ku di bin navê sizayên "hûdûd" de li ser bingeha şirovekirina tundrew a vê rêxistinê ji şerîeta îslamî re encam didan, her wekî cezayê qamçîyan û qutkirina destan di rewşên kişandina cixare û dizîyê de[154]. Cezayên laşî li cihên giştî hatin sepandin, ji bo rêgirtin li kesên ku dibe li dijî desthilatdarîya "Dewleta Îslamî li Iraq û Şamê" bin û tirsê di nav xelkê sivîl de belav bikin[155]. Destên mêrên ku bi dizîyê dihatin sûcdarkirin hatin jêkirin, tilîyên çixarekêşan hatin jêkirin, û zilamên din ji ber ku di nav "jinên ne muhteşim" de hatin dîtin, an ji ber cixarekêşanê, yan ji ber ku neçûn nimêja înê hatin qamçîkirin, an ji ber

---

[149] تقرير الأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق .

[150] Ev baregeha leşkerî  ya artêşa rejîma Sûrî ye, li parêzgeha Reqayê ye.

[151] تقرير الأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق، والأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق

[152] طارق برنجكي،" استراتيجية مناهضة جريمة التعذيب في القانون الدولي والقضاء الوطني"، مرجع سابق.

[153] اتفاقية مناهضة التعذيب وغيره من ضروب المعاملة أو العقوبة القاسية أو اللاإنسانية أو المهينة، اعتمدتها الجمعية العامة، وفتحت باب التوقيع والمصادقة عليها، بالقرار رقم: 46/39، تاريخ/1984/12، على الموقع التالي: https://www.unicef.org/arabic/crc/files/C_Against_torture.arabic.pdfوتقرير بعنوان: حالة حقوق الانسان في العالم- سوريا، رقم 1018/2017.

[154] الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[155] مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

çalakîya bazirganî di dema nimêjê de, an jî ji ber xêzkirina deqek li ser laşê xwe[156]. Îcarê li vir, bê guman rasthatina mirovan ji reşepêşkirina laşî ya daimî yan jî rasthatina wan ji astengdarîyê re weke qutkirina dest û lingan dikevin çarçoveya sûcê reşepêşkirinê û ev yek bixwe ji sûcên şer e.

Dema ku DAIŞ di lûtkeya hêza xwe de bû, cudakarî li dijî jin, keç û kêmarên zayendî weke sîyaseteke giştî[157] bi kar anî. Wê sîstema desthilatdarîyê ya "Dewleta Îslamî" ferz kir û jin û keç xistin bin kontrola xizmên mêr,[158] bi vî awayî azadîya wan a tevgerê bi awayekî bi bandor sînordar kir û ew ji jîyana giştî bi dûr xistin.[159]

Cezayê qamçîyê li dijî kesên ku qanûna cilûbergên asê yên ku ji alîyê DAIŞ ve di nav jinan de bi giştî tê sepandin binpê dikirin dihat bikaranîn, lê ji bo keçên heta deh salî jî tê sepandin. Li herêmên di bin kontrola rêxistinê de jî bi îdiaya "zinayê" û îdamkirina hevzayendan[160] (kesên Gay) hebûn, her wiha ew bi darê zorê bi endamên DAIŞ`ê re dizewicandin. Li rex vê yekê,  endamên DAIŞ’ê jin û keçên êzîdî rastî koletî, êşkence, muameleyên nemirovane, kuştin û tecawizê[161], tevî koletîya zayendî, di çarçoveya pêngava qirkirina li dijî wan de dikirin.[162]

Rêxistina DAIŞ`ê bi van kirinên xwe yên ku li jorê me gotî, ku weke sûcên şer tên dîtin, qanûna mirovî ya navdewletî binpê kir, her wekî êşkence, nêzîkatîyên hişk û ne-mirovane û çewsandina rûmeta jinan, û tundîya li dijî jîyanê.[163] Her wiha kirinên îdamê (recimkirina heta mirinê û bidarvekirina hevzayendan) jî weke sûcê şer ê di çarçoveya kuştinê de tên dîtin.[164]

---

[156] الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقريـر لجنــة التحقيــق الدوليــة المســتقلة المعنيــة بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[157] لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، "فقدت كرامتي": العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية"، A/HRC/37/CRP 3 ،8 آذار 2018.

[158] مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

[159] لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، "فقدت كرامتي": العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق، وتقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، 21A/HRC/46/54 كانون الثاني 2021.

[160] Di qanûna dewleta Sûrî de, reftarên hevzayendîyê weke tecawizîya li dijî mêran, rastî cezayê zindankirinê yê heta 3 salan tê, ev li gorî qanûna cezayên sûrî, madeya 520. Lêveger:
عماد عبيد،" قانون العقوبات الخاص-الجرائم الواقعة على الأشخاص- الجرائم الواقعة على الأموال"، مرجع سابق، وعبود السراج، "قانون العقوبات العام- نظرية العقوبة"، منشورات الجامعة الافتراضية السورية، 2018.

[161] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، 21A/HRC/46/54 كانون الثاني 2021.

[162] لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب......."، مرجع سابق، الفقرتان 56 و57..

[163] Her wiha rêxistina "Dewleta Îslamî" sûcên şer ên weke êşkence û danûstandina hişk li girtîgehên di bin kontrola wê de kirin. Li berê vegere.

[164] Li rûpela 15`an vegere.

Di heman çarçoveyê de, ev binêkirinên han dikevin rêza binpêkirinên xeter ên qanûna mafên mirov a navdewletî, di nav de jî înkarkirina mafê jîyanê, û mafê azadîkirina  ji cudakarîyê.[165]

**Sê- Rehînebirin:** Madeya 8`an a pergala Romayê ya bingehîn, rehînegirtinê weke sûcekî şer dibîne. Ev sûcê han bêyî hebûna hêmanên xwe yên girêdayî sûcdar pêk nayê, ango gerek e sûcdar kesekî/ê yan bêhtir binçav bike yan wan bigire, yan jî wan weke rehînan li gel gefxwarina kuştina wan an berdewamîya girtinê bibe, lê dîsan jî divê hêmanên zanîn û vînê li cem sûcdar peyda bin.[166]

Rêxistina terorîst a DAIŞ`ê gelek rêbaz  ji bo êrîşên bi zanebûn li ser sivîlên kêmarên olî û etnîkî ku piranîya wan jin û zarok in bi kar anîn da ku wan wek rehîne bikar bîne[167]. Hêjayî gotinê ye ku dema Xirîstîyanên asûr yên ku li gundên li ser sînorên çemê Xabûr (bajarokê Tel Temrê - parêzgeha Hesekê) dijîn, di Sibata 2015an de daxwaza parastinê ji Yekîneyên Parastina Gel (YPG) kirin, rêxistina "Dewleta Îslamî" êrîşek li dijî vê deverê pêk anî, û ew veguherand xeta enîyê û di navbera 220-250 sivîlên asûr ku jin û zarok jî di nav de hebûn, hatin revandin.[168]

Di Tebaxa 2014an de, DAIŞê bi hezaran jin û keçên êzîdî ji Şingalê (bakurê Iraqê) revandin û dîl girtin, û ew birin Sûrîyayê. Li wir rastî koletîya seksî, kirîn û firotin wek koleyan, û tundîya cinsî û fîzîkî hatin[169]. Her wiha DAIŞ'ê operasyonên rehînegirtinê pêk anî ku di encamê wan de qurbanî hatin kuştin.[170]

### Çar- Armancgirtina sivîlan bi êrîşên bêserûber û çekên kîmawî

DAIŞ`ê di êrîşên xwe yên berfireh û bêserûber li dijî xelkên sivîlên û deverên wan de sîyaseta kuştina nerewa dimeşand. Li gorî raporteke Rêxistina Efûyê ya navdewletî (2016/2017) tekez dike ku "Hêzên li Sûrîyayê şer dikin sûcên şer û gelek binpêkirinên xeternak ên qanûna

---

165 لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "فقدت كرامتي": العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

166 نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، مرجع سابق.

167 تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة بشأن سوريا، رقم A/HRC/36/55K، 8 آب 2017.

168 تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، A/HRC/31/68، 11 شباط 2016.

169 Heman çavkanî.

170 تقرير الأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

navdewletî pêk anîne, di nav de êrîşên rasterast li dijî sivîlan, êrîşên bêserûber[171], û bikaranîna çekên kîmawî".

"Dewleta Islamî" êrîşên bêserûber bi bikaranîna topên hawin û rokêtan, û her wiha cebilxane û bombeyên bidestçêkirî li deverên ku sivîl lê dijîn pêk anîn. Di encamê de sûcên şer ên êrîşên bêserûber ku di encamê de sivîl hatin kuştin û birîndarkirin pêk hatin.[172]

Ji alîyekî din ve, rêxistinê herî kêm 5 êrîş bi çekên kîmawî pêk anîn, ku hemû li ser parêzgeha Helebê bûn[173], ya yekem li dijî bajarokê Marê, li gundewarê Helebê bû, di 21ê Tebaxa 2015an de, 132 kes[174] birîndar bûn. Lê belê, Komîteya Navneteweyî ya Serbixwe ya Lêpirsînê li Sûrîyê dîyar kir ku rêxistin tenê ji êrîşeke çekên kîmawî berpirsyar e.[175]

**Pênc- Sûcên Zayendî:** Ji dema destpêka şerê Sûrîyayê ve, yek ji sîfatên vî şerî ku her xwe dida pêş, tundîya zayendî û zayendîtî bû[176]. Îcarê, bi zêdebûna alîyên şer re, awayên tundîya zayendî û zayendîtî jî zêde bûn, her wekî tecawizî[177], koletîya zayendî, laşfiroşî û xesandina bi darê zorê[178]. Ev kirinên han sûcên şer in,  û di heman demê de li dijî pîvanên navdewletî yên bingehîn ên mafên mirov in, di nav de mafê jîyanê, azadî, ewlehîya kesane, mafê redkirina êşkenceyê û ji bilî wan ji awayên

[171] تقرير بعنوان حالة حقوق الانسان في العالم-سوريا 2016-2017، رقم POL 10/4800/2017، منظمة العفو الدولية، 2017.

[172] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، 21A/HRC/46/54 كانون الثاني 2021.

[173] الشبكة السورية لحقوق الانسان، "أبرز انتهاكات تنظيم داعش بحق المجتمع السوري وإسهامه في تشويه الحراك الشعبي المطالب بالحرية والكرامة"، مرجع سابق.

[174] Heman çavkanî.

[175] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، 21A/HRC/46/54 كانون الثاني 2021.

[176] “Şîdeta zayendî ya bi pevçûnan ve girêdayî” bûyer an şêwazên şîdeta zayendî, ango destavêtin, koletîya zayendî, fuhûşa bi darê zorê, ducanîbûna bi darê zorê, sterilîzekirina bi darê zorê an her şêweyek din a şîdeta zayendî ya bi vî rengî ya giran, li dijî jin, mêr an zarokan, vedibêje. Li gorî şert û mercan, dibe ku ev sûc sûcên şer, sûcên li dijî mirovahîyê, jenosîd, an binpêkirinên din ên mezin ên mafên mirovan bin. "Tundîya li ser bingeha zayendî" her kiryarek bi zirar e ku kes an komên kesan li ser bingeha zayenda wan dike hedef. Şîdeta li ser bingeha zayendî dikare şîdeta zayendî, şîdeta nav malê, bazirganîya mirovan, zewaca bi darê zorê û kiryarên kevneşopî yên zirardar di nava xwe de bihewîne. Lêveger:

(أنظر تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، (A/HRC/27/21 ) الفقرة 3. وغسان شحاذي منذر، "الحماية الجزائية للنساء من العنف الجنسي في القانون الدولي الإنساني-دراسة تطبيقية على الجرائم المرتكبة من قبل التنظيمات الإرهابية المسلحة في سورية"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية، 2021.

[177] Qanûna sûrî tecawizê sûcdar dike, ku ew wek têkilîya cinsî ya bi darê zorê li derveyî zewacê û destdirêjîya seksî ya li ser jin û zarokan tê pênasekirin, xalên 489-497-ê yên Qanûna Cezayê ya Sûrî. Tecawiz û destdirêjîya seksî bi cezayê hepsê yê bi keda giran tê cezakirin û faktora girantir jî ew e ku kesê tawanê bike karmendê dewletê be, yasaya cezayê, xala 498. Lêveger:

راجع عماد عبيد،" قانون العقوبات الخاص-الجرائم الواقعة على الأشخاص- الجرائم الواقعة على الأموال"، مرجع سابق.

[178] Madeya 8`an ji Pergala Romayê ya bingehîn.

nêzîkatîyên hişk, piçûkxistin û ne-mirovane, her wiha mafê bidestxistina asta herî bilind a saxlemîya laş û mejî.[179]

Zêdegavîyên DAIŞ`ê yên hovane li dijî jin û keçên êzdî ku ji bo Sûrîyayê hatin veguheztin, binpêkirina qanûna mirovî ya navdewletî ne, û dighêjin asta sûcên şer ên girêdyî koletîya zayendî, tundîya zayendî, destdirêjî, û ducanîya bi darê zorê[180]. Piştî ku jin û zarokên êzdî hatin dîlgirtin, li gorî "şerîatê" di nava çekdarên ku beşdarî şerê li dijî Şengalê bûn hatin dabeşandin, li gorî wê pênceyek ji desthilata "Dewleta îslamî" re bû, û paşê ew weke "Xenîmeyên Cengê" belav kirin. Hin jin ji bo zilaman li Reqayê hatin firotin, hin jî li "Îstîraheyên DAIŞ`ê" girtî hatin hiştin, û rastî tecawizyê ji hêla çekdarên ku ji anîyên şer vedigeran hatin.[181]

Di vê derbarê de, kolekirina zayendî ya jin û keçên êzdî, neçarkirina wan li ser ducanîya zarokên çekdarên DAIŞî, xistina milkîyeta zarokan di destê bav de, û rêgirtina DAIŞ`ê li ber derketina nifşekî din[182] ê zarokên êzdî ev hemû sûcên şer ên di çarçoveya koletîya zayendî û ducanîya bi zorê de ne.[183]

Li alîyekî din, bi awayekî giştî DAIŞ jinên nezewicî û keçên gihayî ji bo bawerî û pergala xwe ya civakî weke gefekê dibîne. Ji ber vê yekê, çekdarên rêxistinê bi darê zorê bi jin û keçên li herêmên di bin destê xwe de[184] zewicîn, hin ji wan jinan gihayî bûn, hin jinbî bûn, lê pirranîya qurbanîyên zewaca bi zorê keçên negihayî bûn, û temenê wan di navbera 12-16 salan de bû.[185]

**Şeş- Êrîşên li dijî deverên ku li gorî madeya 8`an a pergala Romayê ya bingehîn parastî ne:** êrîşên li ser deverên ku li gorî her çar rêkeftinên Cinêvê yên sala 1949`an parastî ne weke sûcên şer tên dîtin. Ev deverên

[179] غسان شحاذي منذر، "الحماية الجزائية للنساء من العنف الجنسي في القانون الدولي الإنساني-دراسة تطبيقية على الجرائم المرتكبة من قبل التنظيمات الإرهابية المسلحة في سورية"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية، 2021.

[180] الأمم المتحدة(HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق. ولجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، تقرير رقم A/HRC/46/55تاريخ 11 آذار 2021.

[181] Li berê vegere.

[182] الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[183] نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، مرجع سابق.

[184] Ev kiryara her weha binpêkirinên cidî yên qanûnên mafên mirovan ên navneteweyî yên jin û keçan in, di nav de mafê hilbijartina hevjînê bi azadî û neketina zewacê ji bilî bi îradeya xwe ya azad û tam, li gorî Peymana Li ser Rakirina Hemî Cûreyên  Cudakarîya li dijî jinan, New York, 18ê Kanûna Pêşîn, 1979, 1(B(.

[185] لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، "فقدت كرامتي": العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

parastî jî weke avahîyên olî, hînkarî, hunerî, zanistî, xêrxwazî, şûnwarî, nexweşxane û deverên kombûna nexweş û birîndaran in, ku divê ne xwedî armanceke leşkerî bin. Û heta ku sûcên şer bi cih werin, gerek e êrîş avahîyekê yan zêdetirî yekê armanc bigire û sûcdar bi rewşa heyî ya ku piştrast dike ku pevçûneke çekdarî heye zanibe.[186]

Rêxistina DAIŞ`ê di dema kontrolkirina hin herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê de, bi awayekî taybet deverên olî û peristinê, her wiha deverên şûnwarî yên dîrokî armanc digirtin.

**- Armancgirtina peristgehan:** Bi belavbûna DAIŞ`ê li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê re, êrîşên wê yên li dijî Xiristîyan û peristgehên wan[187] her berdewam kir. Di dema di navberî îlon û cotmeha 2013`an de, çekdarên DAIŞ`ê êrîşî sê dêran li parêzgeha Reqayê[188] kir, û dêra Katolîk a Romanî hilweşandin, ku li navrasta bajêr, nêzî parka Reşîd bû. Çekdaran êrîşî dêrê kir û tevaya kelûpel û tiştên di hundirê wê de talan û wêran kirin, her wekî kursî, xaç, wêne û sembol. Her wiha xaçê li jora dêrê anîn xwarê û li şûna wî ala xwe li ba kir, pê re ew dêr veguherandin baregeheke xwe (navê wê kirin Dîwana Mezaliman). Ne tenê wisa, lê belê dêra Şehîdên ortodoks a ermenan li heman bajarî dagir kir, û li Girê Spî jî dêreke din a ermenan şewitandin, çekdarên "Lîwa El-Hemza" ya bi ser DAIŞ`ê ve ew dêr şewitand, xaçên wê şikandin, kelûpelên wê talan kirin û veguherandin baregeha "ketîbeya Ewlekarî ya Iraqî" ya bi ser DAIŞ`ê ve. Di îlona 2014`an de jî, çekdarên DAIŞ`ê dêreke ermenan li Dêra Zorê hilweşandin.[189]

Li parêzgeha Hesekê jî, Tora Sûrî ya Mafên Mirov 3 dêrên ku piştî ji alîyê DAIŞê ve hatibûn armanckirin û zîyan dîtin, belge kirin. Ew jî dêra Meryem li gundê Til Nasrî, Dêra Saint Rabban Theo li gundê Til Hormuz û Dêra Qebir Şamîya St George, ku li gundê Qebr Şamîya ye, li ser çemê

186 نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، مرجع سابق.

187 Di 23ê Sibata 2014an de, DAIŞê daxuyanîyek belav kir ji bo Xiristîyanên ku ji Reqayê revîyane, ku tê de şert û mercên vegera wan hebû û ew jî ev bûn: Ola îslamê yan jî dayîna baca cizyayê. Di vê derbarê de bi darê zorê misilmankirina çend Xiristîyanên Suryan hat bibelgekirin. Lêveger:
الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

188 الشبكة السورية لحقوق الانسان، "استهداف الكنائس في سوريا"، www.sn4hr.org.

189 الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا،" حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

Xabûr, li gundewarê rojavayê Hesekê ye, ku endamên DAIŞê piştî avêtina ser gund ev dêr şewitand.[190]

Ji alîyekî din ve, û li gorî raporteke Komîteya Lêpirsînê ya navdewletî û serbixwe ku girêdayî Sûrîyayê ye (2014), êrîşên li ser mizgeft û deverên Şî`îyan li Reqayê, bûn sedema koçberbûna wan, û da ku jîyana xwe biparêzin hin ji wan dev ji mezhebê xwe berda. Di gulana 2014`an de, çekdarên DAIŞ`ê mizgefta Uwês El-Qirnî ya Şî`îyan hilweşand, û gorên ku vedigerin sedsala heftan di êrîşên xwe yên li dijî Şî`îyên li herêmê, li Reqayê xerab kirin. Her wiha mizgeftên Sûnîyan jî yên ku li dora mezar û tirbên kesayetên olî hatibûn avakirin wêran kirin, ji ber ku ew weke rengeke ji rengên "şirkê" didîtin.[191]

**-Armanckirina mîrata çandî:** Li gorî qanûna mirovî yan navdewletî û adetî[192] Dizî, talankirin, bikaranîna ji bo berjewendîyên şexsî, û xerakirina mal û milkên ku ji bo mîrateya çandî girîng in, kirinên qedexekirî ne û dikevin nav danasîna tawanên şer[193]. Lê tevî wê jî, hêmanên arkeolojîk ên neguhêrbar ên mîrateya çandî ya Sûrîyeyê winda bûn, ew jî piştî armancgirtina bi qestî ya kevnar û êrîşên bêserûber[194] li ser wan. Tevî hewildanên ji bo veguhestina bi sedan berheman bo cihên ewle[195], kolandinên neqanûnî yên milkên çandî yên binirx berdewam bûn, û berhemên şûnwarî bi qaçaxî birin derve û li bazara reş hatin firotin.[196]

Dema ku DAIŞê di gulana 2015`an de dest danî ser Tedmur (Parêzgeha Humsê), pê re bajarê Tedmur ê kevnar jî kontrol kir, û piştî demeke kurt dest bi wêrankirina birêkûpêk a avahî û abîdeyên kevnar ên bi hezarên salan kir. DAIŞ'ê peykerê Şêrê El-Lat ku sembola bajarê kevnar bû, Peristgeha Baal Şamîn a ku di sedsala yekem a zayînê de hatibû çêkirin, û

---

190 الشبكة السورية لحقوق الانسان،" استهداف الكنائس في سوريا"، مرجع سابق.

191 تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

192 Li gorî qanûna dewleta sûrî ya şûnwaran a dîroka 26`ê cotmeha 1963`an. Lêveger:
رنا محمد سالم الأسود، "حماية الممتلكات الثقافية في ضوء قواعد القانون الدولي الإنساني "سوريا نموذجا"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية السورية، 2020.

193 Li gorî Pergala Romayê ya bingehîn.

194 تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، 21A/HRC/46/54 كانون الثاني 2021.

195 رنا محمد سالم الأسود، "حماية الممتلكات الثقافية في ضوء قواعد القانون الدولي الإنساني "سوريا نموذجا"، مرجع سابق، وتقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية،A/HRC/31/68 ، 11 شباط 2016.

196 Encûmena Ewlekarîyê di biryara xwe ya 2199 (2015) de, wêrankirina mîrata çandî li Iraq û Sûrîyê, çi bi qestî û çi bi bêhemid, şermezar kir. Her wiha bal kişand ser neqanûnîbûna bazirganîya berhemên kevnar, û daxwaz kir ku hemû welatên endam gavên guncaw ji bo rêgirtina li ber bazirganîya bi milkên çandî yên Îraq û Sûrîyê bavêjin, di nav de qedexekirina bazirganîya bi wan tiştan li ser sînoran.

heft bircên definkirinê, di nav wan de Birca Hubal, ku di sala 103'an piştî zayînê de hatîye çêkirin, û Kevana El-Nesir ku yek ji nîşaneyên herî girîng ên Tedmurê ye hilweşandin.[197]

Îcarê, êrîşa DAIŞ'ê ya li ser dêr, avahî, deverên dîrokî û şûnwarî ku ti armancên leşkerî tê de nînin, binpêkirina pabendîya wê ya li gorî hiqûqa mirovî ya navdewletî ye. Armanckirina van cihan bi vî awayî tê wê wateyê ku DAIŞ sûcê êrîşbirina li ser deverên parastî kirîye, ku sûcê şer e.[198]

**Heft- Îdamkirina bêyî rêkarên mîsoger**: Qnûana Mafên Mirov a navdewletî û Qanûna Mirovî yan navdewletî rêgezên ku edaleta tawanî ya eşkere di nav xwe de dihewînin, li gel zanîna tohmetên tohmetbaran û hebûna parêzerekî nûner ji wan re, her wiha ev rêgez her cezayekî bêyî dadgehkirina li gorî pîvan û mercên qanûnî yên destnîşankirî[199] red dike. Lewra, îdamkirina ji derveyî van merc û rêgezên qanûnî weke sûcên şer ên di rewşa pevçûna çekdarî de tên dîtin.[200]

Lê li deverên li jêr kontrola "Rêxistina Dewleta Îslamî", operasyonên îdamkirinê yên hovane û eşkere berbelav bûn, hin caran jî bi armanca tolhilînê bûn. Çekdarên DAIŞ`ê hukimên îdamên bi awayên hovane bi cih dianîn: weke serjêkirin, avêtina ji ser banekî bilind, gulebarandina rasterast, û recimkirina jinan bi keviran. Û da ku DAIŞ van kirinên xwe yên derheqê kesekî/ê yan komek kes de rewa bike, "tekfîrkirin" bi kar dianî yan jî bi buhaneya ku ew kes girêdayî komeke din a çekdar an jî hikûmeta sûrî ye. Di daneyên giştî yên ku berîya îdamê dihatin weşandin, DAIŞ`ê sîfeta "Kafir"[201] li kesên mehkûm dikir. Gelek rewşên îdamkirina kesên girtî ji hêla DAIŞ`ê ve encam didan, piştî ku dadgehên ne-rewa ew hukim dida.[202]

---

197 الأمم المتحدة(HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

198 Heman şavkanî.

199 الأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية" ، مرجع سابق

200 Madeya 8`an ji Pergala Romayê ya bingehîn.

201 تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بالجمهورية العربية السورية، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

202 Li berê vegere.

Ji alîyekî din ve, bi awayekî rotîn, DAIŞ`ê jin û mêr îdam dikirin, eger têkilîyeke qedexekirî di navbera herdu zayenda de çêbû[203], yan jî bi tohmeta "Zînayê". Rewşên recimkirina jinan gelekî li parêzgehên Dêra Zorê û Reqayê[204], di dema serdestîya DAIŞ`ê de, çêdibûn. Jin bi awayekî eşkere bi rêya recimkirina wan heta mirinê[205], dihatin îdamkirin. Jin neçar dikirin ku bi awayekî serûgirtî bisekinin, destên wan qeydkirî, di kortikeke nekûr de disekinîn û paşê mêran bi kevirên mezin li serê wan didan heta ku jîyana xwe ji dest didan[206]. Di pirrê caran de, çekdarên DAIŞ`ê yan jî "El-husiba" (Ketîbeyeke Exlaqî ya Rêxistina Dewleta Îslamî ye), daxuyanîyek dixwendin û tê de sûcê jinê şîrove dikirin, bêyî ku ti delîlekî pêşkêş bikin, û tenê bes bû ku gilî were kirin da ku çekdarên DAIŞ`ê recimê bi cih bînin. Ev kirin jî li qadên giştî dihat cîbicîkirin (Qada El-Neîm li Reqayê weke mînak[207]), xizmên jinê di nav de zarok jî hazir dibûn[208]. Ev dîmenên hovane gelek caran dihatin kêşan û li ser torên înternetê dihatin belavkirin, da ku tirs di nava jinan de belav bibe, eger li gorî rênimayên "Dewleta Îsalmî li Iraq û Şamê" tev negerin.[209]

Rêxistinê her wiha kêmarên zayendî û kesên bi şêweyên cinsî yên hevzayendî[210] tawanbar jî îdam dikirin. Di nav de zarokên ku zilaman dest diavêtin wan û tecawizî li wan dikirin, hin kes bi tawana "Lîwatê (nêrbazî)" dihatin îdamkirin. D vê derbarê de, di tîrmeha 2016`an de, li bajarê Reqayê çekdarên DAIŞ`ê yên bi navê "Rîcal El-Hisba" ciwanekî nûhatî bi tawana "Lîwatê" ji jora avahîyekê avêtin.[211]

---

[203] Di tebaxa 2014`an de, DAIŞ`ê li Meyadînê, li Dêra Zorê, bijîşkeke diranan girt û serjê kir, ji ber ku wê jinê nxweşên mêr û jin (ji herdu zayendan) derman dikirin. Lêveger:
الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، "تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[204] لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، تقرير رقم A/HRC/46/55 تاريخ 11 اذار 2021.

[205] لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "فقدت كرامتي": العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

[206] Divê bê zanîn ku muameleya hovane, êşkencekirin û nîşandana laşên mirî û reşpêşandana terman kiryarên bi qestî yên bi mebesta rûreşkirina qurbanîyan û malbatên wan û biçûkxistina rûmeta wan e û digihêje tawanên binpêkirina rûmeta kesane.

[207] إيلونور لوبرا، "جرائم داعش"، مرجع سابق.

[208] مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

[209] لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "فقدت كرامتي": العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق، والأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق، وإيلونور لوبرا، "جرائم داعش"، مرجع سابق.

[210] غسان شحاذي منذر،" الحماية الجزائية للنساء من العنف الجنسي في القانون الدولي الإنساني-دراسة تطبيقية على الجرائم المرتكبة من قبل التنظيمات الإرهابية المسلحة في سورية"، مرجع سابق.

[211] لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "فقدت كرامتي": العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

Hêjayî gotinê ye ku di dema desthilatîya DAIŞê de zarok hem qurban bûn, hem jî tawankar û şahidên îdamên ku ji alîyê çekdarên DAIŞ`ê ve dihatin kirin[212] bûn. Zarokên kêmî 18 salî, bi behaneya ku endamên komên çekdar ên din li Sûrîyê ne, bi serjêkirin an jî gulebaranê hatin îdamkirin. Ji bilî vê, zarok gelek caran di nav girseya gel, ku şahidîya îdamkirina li qadên giştî dikirin, de hebûn.[213]

Îdamkirina kesên girtî û yên ku li pêşîya dadgehên ne-qanûnî sekinî ne, dikeve rêza kuştin an îdamkirina meydanî, û di encamê de weke sûcê şer tê dîtin. Her wiha, dadgehên pêkenok û ne-rewa, yên ku DAIŞ`ê ava kiribûn, qurbanîyan ji mîsogerîyên wan ên bingehîn ku li gorî rêkarên prosedûr birêve diçin, bêpar dihiştin, ev bixwe binpêkirineke qanûna mirovî ya navdewletî û qanûna navdewletî ya mafên mirov e[214]. Ev dadgehên han bi awayekî taybet ji bo îdamkirina jinan bi recimkirina heta mirinê jî radibûn ku ev yek jî sûcê şer ê di çarçoveya kuştinê de ye, ev ji alîyekî ve, lê ji alîyekî din ve bi awayekî xeternak dijberî qanûna navdewletî ya mafê mirov e jî: Her wekî mafê jîyan, azadî, ewlehîya kesane, mafê redkirina êşkenceyê û gelek awayên dîtir ên nêzîkatîyên hişk, ne-mirovî û piçûkxistinê, ev hem li nik mafê bidestxistina asteke bilind a saxlemîya laşî û mejîyî.[215]

**Heşt- Bikaranîna zarokan û leşkerkirina wan:** li gorî xala 8`an a pergala bingehîn a Dadgeha Tawanên Navdewletî, leşkerkirina zarokan di pevçûneke çekdarî ya ne-navdewletî de, sûcê şer e, ew jî dema ku sûcdar zarokekî yan bêhtirî zarokekî kêmî 15 salan tecnîd bike û bi awayekî çalak di xebatên leşkerî û kuştinê de bikar bîne, tevî ku sûcdar dizane ku ev kes hîna zarok in û rewş dîyar dike ku pevçûneke çekdarî li dar e.[216]

Ji destpêka şerê Sûrîyayê ve, zarok her qurbanên gelek awayên zîyanan bûn û gelek binpêkirin der heqê wan de, ji hêla tevaya alîyên şer ve encam dan,[217] ji ber ku rastî kuştin, reşepêşkirin, û neçarîya beşdarbûna

---

212 مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

213 إيلونور لوبرا، "جرائم داعش"، مرجع سابق.

214 الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق، والأمم المتحدة "بعيدا عن العين.. بعيدا عن الخاطر: الوفيات أثناء الاحتجاز في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

215 لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "فقدت كرامتي": العنف الجنسي والجنساني في الجمهورية العربية السورية"، مرجع سابق.

216 نعمان عطا الله الهيتي، "القانون الدولي الإنساني في حالات الحروب والنزاعات المسلحة"، مرجع سابق.

217 للاطلاع على لمحة عامة شاملة، انظر: لجنة التحقيق "لقد محوا أحلام أطفالي": حقوق الأطفال في الجمهورية العربية السورية، ورقة غرفة الاجتماعات، متاح في: https://www.ohchr.org/ar/2020/01/they-have-erased-dreams-my-children-childrens-rights-syrian-arab-republic

şerê hovane bûn,[218] ew jî piştî ku dihatin revandin û ji dayîkên xwe dihatin bidûrxistin, bi taybet ji hêla rêxistina "Dewleta Îslamî" ve.[219]

Ji dema ku evê rêxistina terorîst dest danî ser deverên berfireh ji Sûrîya û Îraqê, gelek zarok revandin û kirin leşker û paşê ew dişandin navendên perwerdeyê yên taybet, da ku hînî bikaranîna çekan bên û bawerîyên DAIŞ`ê di serê wan de bên çandin.[220] Piştî ku temenê wan dibû 9 sal, ew dişandin anîyên şer. Her wiha gelek caran weke mertalên zindî, yan sîxur yan jî xwebexşên xwînê ji birîndarên şer re dihatin bikaranîn.[221] Bi gotineke din, rêxistinê zîyan digihandin zarokan û bi awayekî sîstematîk û biplan ew bi kar tanîn û tadarî li wan dikir.

Ji wê yekê zêdetir, DAIŞ`ê dibistan ji bo armancên leşkerî bi kar dianîn, zarok dikirin xeterîyê û rê li ber prosesa hînkirinê digirt.[222] Ne tenê wilo, lê belê xwendin û fêrkirin weke alaveke bicihkirina "bawerîya DAIŞî" bi kar dianî,  ew jî da ku nifşekî nû ji alîgirîyan ji xwe re bide avakirin û şervanên nû yên dilsoz[223] ji xwe re amade bike, îcarê di ber vê yekê de, leşkergehên perwerdekirinê (leşkergehên Eşbal El-Xîlafa) li tevaya herêmên li jêr kontrola rêxistinê hatin vekirin[224], da ku wan li ser xebatên şer û êrîşên xwekuj perwerde bikin.[225]

Di 29ê Gulana 2014an de DAIŞê 153 zarokên kurd ên temenê wan di navbera 14 û 16 salî[226] de revandin. Rêxistinê piştre ew di dibistaneke li

[218] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، رقم A/HRC/46/54 تاريخ 21 كانون الثاني 2021.

[219] محمد مصطفى أحمد كريز، "المسؤولية الجزائية عن تجنيد الأطفال في النزاعات المسلحة"، رسالة ماجستير، الجامعة الافتراضية السورية، 2020.

[220] مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

[221] فلا ح عبد الحسن عبد أيوب، "التكييف القانوني لجرائم داعش في ضوء القانون الجنائي الدولي"، مجلة الكلية الإسلامية الجامعة العدد 61، ص 530.

[222] مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

[223] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[224] Her wekî dibistana El-Buhturî li bajarê Babê (parêzgeha Helebê), ku weke leşkergeheke perwerdeya leşkerî û tecnîda zarokên li jêr 18 salan dihat bikaranîn. Her wiha Kampa Şebab El-Şerî`a li nêzî Tebqayê (parêzgeha Reqayê), ku li wir zarokên di navbera 5-16 salan de li ser şer û kuştinê dihatin perwerdekirin. Lêveger:
الأمم المتحدة (HRC / CRP/ISIS) ، تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

[225] Di îlûn û cotmeha 2014`an de, dema ku DAIŞ`ê êrîşî Kobanîyê kir, zarok jî di nav refên wê de hebûn û şer dikirin, lêveger:
مجلس حقوق الانسان a/hrc /28/69 شباط 2015 ص 13.

[226] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

Minbicê de (parêzgeha Helebê) girtin, vîdyoyên serjêkirin û kiryarên leşkerî nîşanî wan da, û ew di perwerdehîya rojane de li ser îdyolojîya şerkirinê ji bo pênc mehan re derbas kirin.[227]

DAIŞ`ê, her wiha di êrîşa xwe ya li ser Şengalê de, zarokên kurd ên êzdî, ku temenê wan di navbera 8 û 15 salan de bû, revandin, ji dayîkên wan bi dûr xistin, û ew birin deverine din li Sûrîya û Îraqê. Bi dare zorê ew kirin misilman, perwerdeya leşkerî û dînî da wan, di nav de çawanîya berdana tifing û moşekan.[228]

Di vê derbarê de, perwerdeyakirina "Rêxistina Dewleta Îslamî" ji zarokan re û bikaranîna wan bi awayekî çalak di xebatên şer û kuştinê de, binpêkirina qanûna mirovî ya navdewletî ye, û bi vê yekê sûcên şer ên biplan û sîstematîk[229] li ser asteke berfireh pêk tîne. Her wiha bikaranîna dibistanan ji bo armancên îdolojîk dikeve çarçoveya binpêkirina qanûna navdewletî ya mirovî û qanûna navdewletî ya mafên mirov, di nav de jî mîsogerîya fêrkirin û xwendinê û parastina zarokan ji xeterîyên şer.[230]

**Dûmahîya Werzê Yekem:**

Di destpêkê de, ji werzê yekem ê lêkolînê ku bi navê "Danasîna Qanûnî ya Binpêkirinên DAIŞ`ê li herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê" ye, dîyar dibe ku şerê çekdarî li Sûrîyayê dikeve çarçoveya şerên çekdarî yên ne-navdewletî, îcarê li vir hemû alîyên vî şerî, di nav de jî DAIŞa terorîst, qanûna navdewletî ya mirovî li ser wan tê meşandin. Ji wê zêdetir, ji dema ku DAIŞ li qada şerê sûrî derketîye û rûberên fireh ji xaknîgarîya Sûrîyayê desteser kir, bi vê yekê ew jî bû alîyekî wî şerî, û sîyasteke şer a belavkirina tirs û xofê di nava civakên xwecih ên li jêr kontrola xwe de meşand. Lewra, gelek sûc bi awayên hovane pêk anîn, ku ew jî dikevin çarçoveya sûcên şer û sûcên jenosîda komî û sûcên der-mirovî, ev sûcên han li gorî yasayên madeya şeş, heft, û heşt ên pergala bingehîn a Dadgeha Tawanên Navdewletî sûcên navdewletî ne.

[227] Heman çavkanî

[228] ميثم محمد عبد، قاسم حمزة، نغم خليل، "التوصيف القانوني لجرائم تنظيم داعش"، مجلة المحقق الحلي للعلوم القانونية والسياسية العدد الأول/ السنة العاشرة ٢٠١٨، متوفر على العنوان التالي: https://iasj.net/iasj/download/a8273515cdf0b55d

[229] محمد مصطفى أحمد كريز،" المسؤولية الجزائية عن تجنيد الأطفال في النزاعات المسلحة"، مرجع سابق.

[230] تقرير لجنة التحقيق الدولية المستقلة المعنية بسوريا، "حكم الرعب: الحياة في ظل الدولة الإسلامية في العراق والشام في سوريا"، مرجع سابق.

Tevî ku dadwerîya bingehîn a Dadgeha Tawanan a Navdewletî ji tawanên DAIŞê yên ku li bakur û rojhilatê Sûrîyê pêk tên re derbasdar e, lê dozên tawanan li dijî tawankarên DAIŞê yên ku di navendên binçavkirinê de li herêma bakur û rojhilatê Sûrîyê girtî ne, nehatine destpêkirin, û ew li pêşberî dadgeha Tawanên navdewletî nehatine dadgehkirin. Nexasim ku civaka navdewletî bi berpirsyarîyên ku dikevin ser milê wê ranebe û bi biryara Encûmena Ewlekarîya Navdewletî kar bo avakirina dadgeheke navdewletî ya taybet ji bo hesabpirsîna çekdarên DAIŞ`ê nake, çimkî DAIŞ îroroj li dijî aştî û ewlehîya navdewletî xeterî ye.

Li alîyekî din, û wekî parçeyek ji berpirsyartîya xwe ya di derbarê dîtina çareserîyekê ji paşmahîya DAIŞ`ê re, Hevpeymanîya Navdewletî ya şerê li dijî DAIŞ`ê jî dikare dadgeheke taybet bi dadgehkirina endamên DAIŞ`ê ava bike. Lê tevî wê jî, hîna dosyaya dadgehkirina girtîyên DAIŞ`ê yên li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê taloqeyî maye, bêyî ku ti destpêşxerîyeke navdewletî yan herêmî ji bo danîna çareserîyeke dadwer a dadgehkirina wan peyda bibe, û edaleta cezyayî pêk were, ji bilî biryara Rêveberîya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê ya taybet bi dadgehkirina wan girtîyan.

Ev yek bixwe, pêwîstîya xwe bi lêgerîneke li mekanîzmeyên dadwerî yên pêkan ji bo hesabpirsîna endamên DAIŞ`ê heye, da ku li ser sûcên ku li Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê kirine bên cezakirin, her wiha lêgerînek li astengîyên li pêşîya prosesa dadgehkirina wan û bicihanîna edaletê ji qurbanîyan û tevya civaka navdewletî re disekinin **(ev mijar bixwe jî, naveroka beşa duyem a vê lêkolînê ye).**

***

**Hemû mafên belavkirinê ji Navenda Firatê ya Lêkolînan re parastî ne 2023©**

**Navenda Firatê ya Lêkolînan**

**Sazîyeke lêkolînan a serbixwe ye, girîngîyê dide mijar û meseleyên siyasî, aborî, civakî û fikirî yên girêdayî Rojhilata Navîn û Sûrîyayê bi giştî, û herêmên Bakur û Rojhilatê Sûrîyayê bi taybet.**

https://firatn.com/